

11
9 771301 749707

Erîşkarî ne çare ye,
Gel ji meydanan venakîse

R. 3

Heyveyîn ligel Zerdeş Haco:
 PEN'a Kurd,
 dilşahiyeke mezin e


R. 8-9

Vîranîn-Zülküf Kışanak:
 Qîrîna ke viran kewta,
 qe vîrî nêbena

R. 6

Mem Botanî-helbest:
 Evîna min
 Helepcê

R. 12



SAMİ TAN

Prafiqa gelê kurd a çend rojan nîşan dide ku dewleta tirk bi vî awayî nikare tu encamê bistîne, gelê kurd wê cejna xwe ya neteweyî bi dest gurgebozan ve bernede û wê bi girseyî pîroz bike.

Meha adarê wekî meha çalakiyan tê binavkirin. Büyerên ku di nava hefteyekê de qewimîn, vê dîtinê diselmîne. Adarê bi çalakiyên karmandan dest pê kir. Karmendênu ku li dijî pêşnûmaya zagona sexte ya sendikayê têdikoşin, li Engereyê, Qada Kızılayê girtin bin bandora xwe. Lî hêzên dewletê pêşî xwestin wan bi ava bişid ji hev belav bikin, pişti ku di vê yekê de bi ser neketin, içar dest avetin bombeyen gazê, bi darê zorê karmend ji hev belav kirin. Lî roja din dîsa karmandan berê xwe dan heman qadê. Digel vê yekê li gelek cihêne din jî çalakiyên wan pêk hatin. Her wiha karmandan, qada Taksîmê ku çend rojan berî wê ji hêla girseya Hadepî ve hatibû dagirtin, ji nû ve girt bin bandora xwe.

Piştî wê ji Taksîm bû qada çalakiyên derderen demokrat û welatparêz. Vê rewşê heta 8'ê adarê dom kir. Di 8'ê adarê de hêzên dewletê xwestin ku bi êrîşkê dawî li vê rewşê bînîn, lewre jî heman narîncokên gazê yên li dijî karmandan hatibûn bikaranîn, li dijî girseya ku Roja Jinê Kedkar ên Cihanê pîroz

dikir jî bi kar anî. Di nav vê girseyê de hejmareke mezin a zarokan jî hebû.

Îsal jînên kedkar roja xwe bi girseyî pîroz kirin, pîrozbahîyen wan ne tenê li metropolên tîrkan li Kurdistanê jî pêk hatin. Li Amedê bi hezaran kesî tevi hemû astengiyê hêzên dewletê jî pîrozbahî pêk anî; daxwaza xwe ya aşî û azadiyê anîn zimên. Komek jînên kedkar ku xwestin biçin Amedê bi jînên kurd re rojê pîroz bikin, lê dewletê nehiştu ku ew bikevin nava Amedê. Bi vê yekê jî hate selmandin ku ew der welateki din e.

Lî piştî vê êrîşê jî dawî li çalakiyan nehat. Di salvegera tevkujiya Taxa Gazî de meş û xwepêşandanen girseyî pêk hatin. Di rojeva derderen demokratik de bîranîna şehîdîn Helebçe û şehîdîn tevkujiya 16'ê adarê heye. Ji bo me kurdan rojeva giřingtirin jî pîrozkirina

Dewlet dixwaze bi êrîşen li ser saziyên kurdan girseya gel çavtîrsî bike, da ku Newroz bi awayekî girseyî neyê pîrozkirina. Lî pratiqa gelê kurd a çend rojan nîşan dide ku dewleta tirk bi vî

awayî nikare tu encamê bistîne, gelê kurd wê cejna xwe ya neteweyî bi dest gurgebozan ve bernede û wê bi girseyî pîroz bike.

Di dawiya vê nîvîsî de, em şehîdîn Helebçe, Gazî, 16'ê adarê û şehîdîn Newrozî bi bîr tînin û Newroza gelê xwe pîroz dikan.

Ev çend hefte ne, me dil heye ku em li ser guherînên di rojnameyê de we agahdar bikin, lê li hev nayê. Her wekî bala we ji kişandibe, Serokê İnnituya Kurdi Hasan Kaya beşdarî nava: nîvîskarêne me bû. Berî wî Kazım Temurlenk, ketibû nav refen nîvîskarêne rojnameyê. Berî niha bi hefteyekê Serkan Birusk, dest bi nîvîsandina di rojnameyê de kir. Hevalê Ahmet Gölbaş-ku berê di Welatê Me de xêz cêdir, bi quncikê "Isot" dest bi xebatê kir. Bi vê hejmare pê ve me dest bi amadekirina rûpela zarokan kir. De zarokêne roj û agirî rûpela xwe vala nehîlin, wê bi berhemîn xwe bixemîlin. Ji bo guherînên nû em li benda rexne û pêşniyarêne we ne.

Agir li Kurdistanê bêhtir pîroz e

Ferhengok

afîn: veşewîfîn (içten yanmak)

awar: normal

(şöyle-böyle)

berjeng: delîl (kanıt)

beyanî: sibe

bîlîsîn: vebîrûsîn (parıldama)

bijang: mijang (kirpik)

bîrû: (kaş)

bûtlîk: kolik, xincik (korkuluk)

darîştin: hilberandin, afîrandin

demajo: pêvajo (süreç)

derfet: imkan

dirinde: hov, hewş

dozîn: dîtin (ığgûdü)

erjeng: tırsnak, xeternak

gelempersî: gişî, tevayî

gewîf: qırık (boğaz)

gorepan: war, qad, hol

hejzemin: erdhejî, zelzele

hoy: merc, şert

kutik: çêlikên lawiran

lan: skefta sewalan

lênlîsk: defter

mîşxît: qaçax (sirgün)

moşek: fûze

nalcax: kulbel

narinçol: bombeya destan

newa: awaz, melodî

perestgeh: ibadetxane

peyker: heykel

pişik: penkreas

pîrpirok: minminik (kelebek)

qedimandin: nêzbûn

qîjn: qîrn

qîrn: sedsal, esr

qumâtik: pêçek, qûndax

remz: nîşane, simbol

rex: alî, hêl, lay

rîkn: hîm, bingeh (temel)

sewt: deng, hes

stikur: paşıya stû

swêmek: pasar, siving, sibande

sosret: ecêb, rezil

stemkar: zordar

şanazî: iftîxar, gurur

şaristanî: medeniyet

şipîn: dilopkirin

tîxûb: sînor, hidûd

weslewesele: parce parce

xurîcîn: rijna stérkan

yâşîgh: cih û warê listikan

M. EMİN ALTOX

Agit jiyan e, azadî ye, zanist e, xwestek e, şaristanî ye, cewher e, ronahî ye, mirovahî ye, bawerî ye, evîndarî ye, alîkarî ye, spehîbûn e û wekî kurtahiya navê xwe ar (namûs) e.

Ji bo ravekirina pîrozî û fêdeyên wî yên ku li mirov û mirovahîye dibin, pirtûk têrê nakin. Heke ew bi dorfirehî bêne nîvîsandin, divê mirov çend cild pirtûk binivise.

Her çiqas naskirin u emilandina agir bi temamî sayî nebûbe jî, tê pejirandin ku, di dewra mîtolojîk a, heyamên berê de agir bûye sedema şerê xwedan û titanan. Dîsa tê gotin ku, promethus agir, ji Zeus diziye û daye mirovan. Her çiqas wisa tê pejirandin jî, tê zanîn ku, destpêka mirovahîye li Mezopotamyayê, jiyan demanî ya pêşin û kedikirina ajalan (heywanan) jî li Zagrosan dest pê kiriye. Çinê mirovahîye, afirandin û pêşketina şaristaniyê, destpêka fîkr û olên yekxwedayî li wir dest pê kiriye.

Li dergûşa şaristaniyê ya ku hemû destpêken jiyanê û riknê zanîyê lê hatine danîn, agir hîn pîrozî û terora Kemalizmê

roztir e. Lewre hîna beriya zayîna îsa, di heyama Gutî û Qasiyan de, agirê Newrozê li Mazopotamyayê ges dibû. Zerdûştiyan di perestgehîn xwe de agir her tim pêketî dihiştin û ji bo ku agir nelewite jî, dema ku di ber agir re diçûn, nedîhiştin ku hilma wan lê bikeve. Dema ku Magesen Zerdûş, li dora agir bûn, paçek didane ber devê

Di heyama Gutî û Qasiyan de, agirê Newrozê li Mezopotamyayê ges dibû. Zerdûştiyan di perestgehîn xwe de, agir pêketî dihiştin û ji bo ku agir nelewite jî, dema ku di ber agir re diçûn, nedîhiştin ku hilma wan lê bikeve.

xwe, agir ji hilma xwe diparastin. Dîsa her pîseyek bi agirekî dihate nasîn. Dused û şanzdeh pîse, bo dused û şanzdeh agir simbol kribûn. Bi Kawayê Hesinkar jî, ku bi agir encama zilma Deheqê xwînxwar mizgîn dabû, gelén Mezopotamyayê, li Kurdistanê agir bûbûnîşana azadiyê.

Zaliman dikir nedikir, nikaribûn agirê azadiyê dîl bigirin. Bi sê niftikan Kawayê Hemdem Mazzlum Doğan, ji Zindana Amedê li dijberî zilm û terora Kemalizmê

agirê azadiyê gur kir. Çaran bi bedena xwe ew ges kir. Ji wir şaxê xwe avete bircen Amedê, Zekiye restariya faşîzmî qetand, Rehsan şewqa wê ji Qedîfeqeleya İzmîre li gelê penaber belav kir. Ronahî û Bêrivanê sînor nas nekirin, di navika împeryalizmî de ew şopandin. Vedat û Hamdullah ji tarîbüna Zindana Bayrampaşa agirê azadiyê bi bedena xwe gur kir, bi zebeniyê Zindana Amedê de wekî moşekî teqîyan. Dîsa Mîrza Mihemed Çimen jî, bi agirê ku bi bedena xwe xistibû, zebanîyê Zindana Erziromê şewitan din. Û agir, xiyaneta ku asîmîlasyon û mîtingerîyê xistibû hundîre kurdan, Eser Altınok di navenda Ewrûpayê de, di bedena xwe de şewtan, xiyanet kuşt û agirê azadiyê bilind kir.

Helbet li Kurdistanê agir dê bêhtir pîroz be. Pîrozî ges bûye. Lewre, li Kurdistanê agirê azadiyê bi giyan û bedena mirovan bilind bûye. Şewqa xwe li her çar aliye cihanî belav dike. Bi vî agirê pîroz, navê kurdan û Kurdistanene azad di lînûska cihanî de dinivîsin û kurd bi vî agirî di nav gelê cihanî de li cihekî birûmet rûdin. Berdelê agir, azadî ye. Agirê ku bi bedenan geş bibe pîroz e.

Erîşkari ne çare ye, Gel ji meydanan venakise

Mahmut Şakar li ser piştgiriya kedkaran û HADEP'ê ji rawestiya û diyar kir ku, di nav KESK'ê de kedkarên politik hene û ew dikarin ji bo mafêñ xwe têbikoşin. Li aliyê din di nav KESK'ê de karmendêñ welatparêz ji gelek in û ji bingeha hevkariyê xurtir dike.

Hikûmeta 54'an bêhtirin ji aliyê gel ve wekî hikûmeta çeteyan hate binavkirin û piştre hikûmeta 55'an hate avakirin. Hikûmete 55'an ji dêvla ku daxwazêñ gel bi cih bîne û li Tirkîyeyê pêsiya demokrasiye veke, ji roja ku bû desthilatdar zem li pey zeman hat û hevkêseyâ parvekirina dahatûya giştî ya neteweyî serobino kir. Ji ber vê yekê dijberî û reaksiyonêñ li dijî politikayêñ hikûmetê berz û gur bûn. Digel vê yekê êris û çewsandinêñ Tirkîye li meydanan roj bi roj zêde bûn.

Wekî tê zanîn bi qanûna ‘tasarufa mecbûri’ mafêñ kedkaran ên bingehîn tê standin. Bi vê qanûnê dewlet dixwaze bingeha arizikirinê (özelleştirme) amade bike. Ji bo vê yekê ji gelek karker û karmend ji kar têñ avêtin û politikayêñ ji bo bêsendikakirinê xurt û tund dibin. Her wiha bi qanûna ku malnîşiniyê (emeklik) ji nû ve saz dike, kedkar dikevin tengasîyê. Ev qanûn ji aliyê kedkaran ve wekî ‘malnîşiniya di goristanê de’ hate nirxandin. Her wiha li ber vê yekê saziyêñ ji bo ewlekariya civakî (SSK, Bağkur) li gorî berjewendiyêñ desthilatdaran tê sazkin. Tevî van yekan prensiba ‘Dewleta civakparêz’ ku di qanûna bingehîn de cih digire bi tenê li ser kaxizê maye.

Butçeya şer kedkaran diçewisine

Ji aliyê din ve ev heşt sal in ku kedkaran ji sendikayêñ endamê KESK'ê bi berxwedanêñ xwe hin mafêñ xwe bi dest


xistine. Lê dewlet dixwaze van mafan bi awayekî hovane ji destê kedkeran bistîne. Dewlet hewl dide xwe ku sendikayan bi ke wekî komelayan û bi vê mebestê êrisen xwe yên li ser kedkaran zêde dike.

Êrisa herî dijwar a li ser kedkaran bütçeya sala 1998'an ne. Ev bütçeye ji bo berjewendiyêñ desthilatdaran hatiyê amadekirin û bi kêri kesen ku li pey rantiyê ne tê. Lê di bütçeyê de ji bo lêcûnên ser beske mezîn hatiye vejetandin. Li aliyê din di warê berhevkirina bacan (vergi) de barê giran dikeve ser milê kedkeran. Her wekî ku ew yek têre neke, ji bo ku lêcûnîn ser berhev bike, bacen sosret diafirine. Bi vê ji namîne pereyên ku ji imperialstan deyn dike ji ji bo nûjenkirina amûren ser xerc dike. Bo nimûne 5 milyar dollarê ku wekî diyeta şerê kendavêji Erebistan, Kuveyt û DYAY'ê standibû, giş li balafiran xerc kiriye.

Di destpêka meha adarê de li hemû Tirkîyeyê çalakiyên cur bi cur pêk hatin. Kedkaran, ji destpêka meha adarê ve çalakiyên xwe dan destpêkirin. Li dijî qanûna ‘Pêşnûmaya Qanûna Sendikaya Karmendan’ ku mafê grev û peymanan venagire, kedkarên girêdayî KESK'ê li hemû warêñ kar û xebatê çalakiya kar nekirine dane destpêkirin. Beramberî vê yekê, dewletê bi awayekî zordar êris bir ser meşa yekemin a kedkaran. Lê piştî ku dewletê li hemberî xwe berxwadaneke dijwar dît gava xwe bi paş ve avêt û rayedarên dewletê ragihand ku wê di dawiya sala 1998'an de li ser qanûna grev û peymana giştî bê rawestîn.

Tê ragihandin ku bi van êris û çewsandinêñ xedar dewlet dixwaze pêsiya çalakiyên din bigire. Dewletê ev yek di pirozbahiyêñ ji bo roja jînêñ kedkar ên cihanê de baş nîşan da. Vê yekê xwe berî bûyera Gaziye bi rojekê ji bi ser girtina malen serokêñ navçeyêñ HADEP'ê ji da der. Ji ber ku wekî diyar e meha adarê wekî ‘meha çalakiyan’ tê nasin. Ji ber ku bîranîn û pirozbahiyêñ ‘Terteleya Gazi, Helepçe û Cejna Newroz’ di vê mehê de têñ lidarxistin.

Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar li ser rûdanêñ dawin pîrsen me bersivandin. Mahmut Şakar da zanîn ku, dewlet bi awayekî zanayî van êrisan pêk tîne. Wî bal kişand ser êrisen dawin û çalakiyên meha adarê û wisa axivî: “Dewlet niha li hemberî xwe muxalefeteke bi hêz dibîne. Ev demeke dirêj e ku kedkar bi berxwedaneke bi vî rengî



derneketbûn meydanan. Dewlet dixwaze hêzên muhalif biçewisine.”

Mahmut Şakar li ser piştgiriya kedkaran û HADEP'ê ji got ku, HADEP li ser tekoşına ji bo mafêñ kedkaran ava bûye. Şakar diyar kir ku, di nav KESK'ê de kedkarên politik hene. Ew kes dikarin ji bo mafêñ xwe yên demokratik û yên sendikayî têbikoşin. Şakar girêdayî vê mijarê wisa axivî: “Ev mirov gihişfine wê baweriye ku bi tenê dikarin mafêñ xwe bi awayekî rîkxistî bidest bixin. Li dijî vê yekê dewlet nikare tiştekî bike. Dewlet van kesan wekî kesen xeternak dibîne û dixwaze biçewisine”.

Ji bo eniyeke dijber rewş guncaw e

Li aliyê din wekî diyar e, di nav KESK'ê de endamên welatparêz ên kurd gelek in. Êrisen ku li ser KESK'ê pêk têñ, bi vê yekê ve ji têñ girêdayin. Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar ji der barê vê yekê de got ku, di nav KESK'ê de kedkarên kurd gelek in û giraniya xwe didin nîşan. Bi baweriya Şakar, kedkarên kurd, di warê berxwedan û têgihiştina politikayêñ kirêt ên dewletê de hê berxweder û zana ne. Wî got: “Ji bo eniyeke dijber û muxalif rewş guncaw e. Dibe ku KESK pêşengîya blokekê ji bike, ev helwesta kedkeran wekî partî bo me gelekî girîng e.”

Serokê şaxa HADEP'ê ya Stenbolê Parêzer Mahmut Şakar da zanîn ku, êrisen dewletê ji bo ku Newroz bi awayekî girseyî û dilşadî nedin pirozkirin zêde dibin. Wî got ku, ligel van yekan ji, ev êris nikarin rî li ber pirozbahiyêñ girseyî bigirin. Şakar qala helwesta çapemeniya Tirkîyeyê ji kir û di dirêjahiya axaftina xwe de wiha got: “Çapemenî hin tiştan terorize dike. Ev ji politikaya li dijî Newrozê ye. Ew dizanîn ku wê bi hezeran kes li hev bicivin. Lewma wekî bergirî hem HADEP'ê terorize dîkin û hem ji kesen ku besdarî çalakiyan dibin teşhir dîkin. Qonaxa ku iro em gehîstine û têkoşîna me divê bê dîtin û bi vê yekê divê bi awayekî hêz û gestir Newroz bê piroz kirin.”

AZAD ALTUN

Kurtenüce

Ji hêla ATO'yê ve, der barê bombe û gazên hêstirbarînerde, ku li Qada Kızılayê li ser karmendan hatibûn bikaranîn de, lêkolînek hate çêkirin. Sekreterê Giştî yê ATO'yê Dr. Cahit Oğan, ragihand ku, heman gaz ji hêla leşkeren İsraili ve li hemberî filistîniyan tê bikaranîn. Oğan, der heqê lêkolînê de wisa got: “Li gorî lêkolîna me, ev gaz ji bo tendirustiya mirovan gelek bi xeternak in û li tevâhiya Ewrûpayê ev gaz qedexe ne. Bi tenê ev gaz li Filistîn, Vietnam û Koreyê tê bikaranîn”

Mêre Şükran Aydin Abidin Aydin, piştî tehdît û gefen cerdevan û leşkeren roja 7'ê adarê ji hêla Emniyeta Dêrikê ve hate binçavkirin. Peyre, polisan ew ji bo lêgerînê birinê mala wî. Bi pey ragihandina xizmîn Aydin, di dema lêgerînê de, ew gelek bê-taqet bûye û tê derxistine ku işkenceyên giran dîtiyê, lewre ji wan serî li İHD'ye dane. Piştî vê bûyerê. Serokê İHD'ya Mêrdinê Cemîl Aydoğan û Sekreterî İHD'ye A.Vahap Bakış serî li Serdozgerê Mêrdinê dan û gotin ku piştî mehkûmkirina dewletê ji hêla AİHM'ê li ser malbata Aydin zordarî zêde bûne.

R oja 10'ê adarê, ji bo salvegera bûyerê Gaziye, li Fakulteya Tipê a Zanîngeha Stenbolê ji hêla “Yekîtiya Demokratik a Xwendekaran (DÖB)” ve daxuyaniyek ji bo çapemeniyê hate ragihandin. Di daxuyaniyê de hate gotin ku, li Taxa Gaziye, di 16'ê adarê de li Beyazıt û Helebçeyê, li Çukurca, Mereş û Çorûmê bi deh hezaran fail-i mejhûl hene. Her wiha ji çapemeniyê hate xwestin ku roja 12'ê mehê çepgir, welatparêz û demokrat berê xwe bidine Gaziye.

Sekreterê Giştî yê Rojnameva-nen Sinornenas (RSF) Robert Menard ji Wezîrê Dadê Oltan Sungurlu re nameyek şand û got ku, divê di zûtirin demê de nûçegiyan Ü. Gündemê Faruk Aktaş û Bülent Acar bêne berdan. Sekreterê Giştî yê Rojnamevanen Sinornenas Menard, di nameya xwe de bi bîr dixe ku Aktaş û Acar roja 8'ê adarê di pirozbahîya Roja jînêñ Kedkar ên cihanê de li Taksimê tevî 50 kesî hatine binçavkirin lewre ji ew ji bo vê yekê dewletê şermezár dîkin.



Di şoresê de rola rewşenbîran

Dema bajarê Lenîngradê ji hêla alman ve 872 rojan hate dorpêckirin hemû hunermend û rewşenbîren Sovyetê bi tenê yek armanc danîbûn ber xwe; ew ji ew bû ku gotinên wan bibin gule li dijmin bikevin. Lê gelo Kurdistan çiqas sal in di dorpêckirinê de ye? Rewşenbîr û hunermendên me ji bo vê yekê ci gotine? Gelo çima pir ji wan bêdeng mane? Çima xwe dûr dixin û direvin?

Kurdistan di demajoyeke dîrokî re derbas dibe. Li havirdora welêt ser e, mirovahî di bin lingan de diperçiqe, dijminen kurdan yên ku bi hezaran sal dijberî û nexwesi di nav wan de peyde bûne, li ser serên kurdan dibin yek û naxwazin ku yek jî bibêje ku ew jî mirov e, deng jê derdikeve û dixwaze bijî. Bi hezaran gund û bajarê Kurdistanê dişewitin, bi sedan ton bombe bi ser deşt, newal, zinar û çiyayêne welet de dibarin; qîreqîra zarok, jin, pîr û kalan e, di wan gundên wêrankirî de, di şikeft û qulên tarî de hejzeminê çedike û dilê her insaneke xwedî şeref û namûs parce parce dike.

Li hemberî vê rewşa jihevketî, hovîtiya mêtîngîrên dîrokî, çekêne giran, noker, xwefiroş û ihaneta hezar salan; agirê şoreseke zanistî û nûjen vêketiye, roj bi roj pêtîn wê gur dibin û sitem û zora salan dişewitîne. Bi hezaran keç û xort, yên xwedî nav û deng, xwedî cih, xwendekarê rewşenbîr; xwe kirine êzingên agirê vê şoresê, bi mîranî ser dikin û xwînê dirijînin, tenê ji bo ku welatê xwe, ji bin sitemkariya dijminan derxînin û maleke mezin û azad ava bîkin. Lê belê rewşenbîren ne di ser de, gelo wê çawa rola xwe bi cih bînin?

Rewşenbîr, bi gelempêri, ew mirovê xwendekar, têgihiştî û zana ye, zû tiştan ji hev derdixe, ew jî doktor, endazalar, mamoste, hozan, nivîskar e.

Di dîroka Kurdistanê ya kevn û nûde, ji van kesan, beşekî xwe daye pêş, ji bo welatê xwe xebitiye û beşek jî li paş bêguh û çav maye.

Dr. Nûri Dêrsimî rewşenbîrekî kurd bû, çiqas gazî kir, lê kese kî pê ve ranebû, li ser kêla tirsa wî çend gotinên wî wiyo nivîsandine:

Min jî li ser vê rêça dijwar
Gelek kiri qîr û hawar
Da ji bo we jî rojekê
Dinya bibe gulbahar

Di dema niha jî de, berxwedanê ji aliye rewşenbîren wekî Mezlûm, Xeyrî, Egîd, Bêrîvan, Zekiya û sedan hevalen wan; hatine kirin, tu caran di nav kurdan de nayîn jibirkirin. Gelo Xeyrî, berî ku di bin wê sitem û lêdana faşîstên tirkan de şehîd bikevin, ci digot: "Dema ez şehîd bûm, li ser kêla tirba min binivîsin ku xwediyê vê gorê deyndarê welatê xwe ye." Gelo ev ci dil û ci bawerî ye?



Dema ew têkoşîna rewşenbîren cihanê bibihîzin û li ser rola wan, di serxwebûn û azadiya welatên wan de râwestin, hingê ewê bizanibin, gunehê me çiqasî mezin û giran e, kêmâniyêne me çiqas kûr û bêjimar in.

Dema şerê cihanî yê duwemîn, li ser xaka rûsan germ û giran bûbû, rewşenbîren wan bi roleke mezin û giřing radibûn û di qada ser de wekî leşkeran bi pêñûsên xwe, ser dikirin. Hozana millet, bi nav û deng Tarasova dibêje: "Li vir di eniyê de, min wateya gava pêşketinê fêm kir. Her bihurst xaka ku ji almanan hate standin, her gaveke bi pêş de, vegeandina xaka welêt ya di bin zorê de ber bi jiyanê ve ye. Me bi çavêne xwe dît gundên ku tiştek ji stûnên reş pê ve jê nemabûn, dêrên rûsan wêrankirî û bajarê şewîfî me gelek termêne keç, zarok û pîran didîtin, yên ku nikaribûn ji ber faşîstan baz bidana."

Pir ji rewşenbîren rûsan, şanoger, helbestvan û dengbêjî di kamyonên leşkerî de, li qada ser digerîyan û pir ji ahengên xwe, di xêzikên şerê yekemîn de çedîkirin. Leşkeran di kozikên xwe de helbest û stranên şoresgerî digiton û vê yekê moralâ wan pir bilind û bi hêz dikir.

Rewşenbîrê rast û durist, ew e ku ji bo xaka welatê têkoşînê dike, dema ku

ew di cihê lingên xwe de dorpêckiriye, yan di zindanê, yan jî li ber stûna darvekirinê ye. Ew e yê ku dûr û fireh ramân dike, ji ber wilo em dibînin, bê çima Ho Shi Mihn di zindanê de helbest dinivîsandin, çima nameyên Roza Luxsemburg di zindanê de ew qasî bi wateyên kûr bûn, çima her şoresgerek pirtûkeke xwe ya nazdar bi nav û deng heye.

Dema bajarê Lenîngradê ji hêla alman ve 872 rojan hate dorpêckirin hemû hunermend û rewşenbîren Sovyetê bi tenê yek armanc danîbûn ber xwe; ew ji ew bû ku gotinên wan bibin gule li dijmin bikevin, morala şervanan bilind bikin, di dilen mirovên sovyetî de kîna dijminan biçînin û hêzkirina welêt mezin bikin.

Lê em pirs dike gelo Kurdistan çiqas sal in di dorpêckirinê de ye? Rewşenbîr û hunermendên me ji bo vê yekê ci gotine? Gelo çima pir ji wan bêdeng mane? Çima li Zengilê hawarê guhdar nakin? Çima xwe dûr dixin û direvin? Gelo kor in, nabînin, an ker in nabîhîzin? Rast e beşek ji kesen xwedî şan û şeref riya welatparêziyê girtine û berxwedaneke bêşînor dike, lê ev beş tenê nebes e, pêwîst e, hemû kesen xwe bi vî rengî dibînin bikevin rêza wan û pêñusa wan pakrewanê ku xwîn rijandine,

bêxwedî nehêlin û bi dil û can piştgiriya tivingen servanên serê ciyan bikin.

Îroj, insanên me gihiştine, wê baweriyê ku di wê xweşbûna Ewrûpâyê de ji bo welatê xwe, agir bi canê xwe bixin ta ku şehîd bibin, ev qehremaniya ku di Newroza 1994'an de li Almanyayê çebû, dilen xelkê cihanê bi piranî êşand, bi sedan nivîsa di rojname û kovarên biyanî de li ser hatin weşandin.

Di deşt û çiyayêne welet de ji keç û xorêt me, bi mîranî wekî şeran êrişan dibin ser dijmin û gav bi gav xaka welet ji sitem û gemariyê paqij dike, ta dilopa dawi ji xwîna xwe vê berxwedanê dike û berî ku şehîd bikevin jî dibêjin: "Em deynbarê Kurdistanê ne."

Ma ne hêja ye ku hemû rewşenbîren kurdan bikevin rêza wan, li ser wan bîbêjin û binivîsin? Ev şeref û namûs, ev rûmet her dem bi dest mirov nakeve û ev derfet jê re naye.

Dîrok bi guh e, bi çav û mejî ye, dibihîze, dibîne û dînivise. Rûmeteke geleki mezin daye mirovên welatparêz, kesen bi rûmet û iro jî vê yekê dînivise, lê nizanim kesen ku xwe dûrî welet dike, sitem û zorê ji ser xwe ranakin, xwesiparî û bindestiyê dipejirinin; nizanim gelo wê sibe dîrok ci li ser wan binivise?

Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

-Wane 2-

Dengdêrên ku ji erebî derbasî kurdî bûne:

Hinek dengêrên ku ji erebî derbasî kurdî bûne jî, niha dibe sedema hinek sergêjî û gelemşeyan. Ev dengêrên “eyn, xeyn, hê” ne tenê di peyvîn ku ji erebî derbasî kurdî bûne de têne bikaranîn, her wiha wan bandora xwe li hinek peyvîn kurdî kirine û di wan de jî guherîn çêkirine. Bo nimûne peyva “hesin” peyveke resen a kurdî ye, lê ev peyv li nav hinek kurmancan wekî peyva Hesen, Helîm tê bilêvkirin. Lewre jî hinek nivîskar apostrofekî datînin ser /h/yê. Dîsa peyva “ewr” bi eyna erebî tê bilêvkirin, heta li hinek herêman peyva “çav” jî wekî “ç’av” tê bilêvkirin ku hinek nivîskar jî bi vî awayî dinivîsin. Gelek peyvîn ku bi “xeyn” a erebî têne bilêvkirin hene. Wekî nimûne mirov dikare peyva “xezal” bide. Hinek kes ji bo nîşdayîna vê tîpê jî niçikekî datînin ser /x/yê, lê hinekîn din li şûna vê yekê /g/ya tirkî tercîh dikan.

Li ser vê mijarê dîtinêni li dijî hev hene, hinek kes dixwazin ku hemû dengêrî di zimêne de bi nîşaneyan ango bi tîpan bê nîşdayîn, ew kes rengdengan jî wekî deng dipejîrinin û bi vî awayî jî hejmara tîpê kurdî dibe 38. Gelek ziman-

zanîn ku li ser dengzaniya zimanê kurdî hûr bûne, didin zanîn ku gelek rengdengan din jî hene.

Gelek zimanzan jî li hemberî vê nêzîktedaya ku hejmara tîpan zêde dike, radibin û dixwazin ku bi tenê dengêr bingehîn bi tîpan bêni nimandin. Li ser rexneyen Apê Osman Sebri yên di vî warî de, Celadet Bedirxan jî dide zanîn ku her kes lê dixebeithe hejmara tîpê xwe kêm bikin, divê kurd jî li ser vê rîbazê bimeşin. Lewre ew tîpê zêde di perwerdehiyê de arîşeyê derdixin, karê hînbûn û nivîsandînê dijwartir dikan. Bersîva zimanzanen kurd ên li ser tîpê ku ji erebî derbasî kurdî bûne jî bi şeweyekî din e. Ew dibêjin, dengêr navborî ji zimanekî din derbasî kurdî bûne û dengsaziya zimanê kurdî dirûxîni. Lewre jî em wan hêdî hêdî ji nav zimanê xwe derdixin. Dema mirov dengekî bi tîpan nîşan bide, mirov wî dengî mayinde dike, lê dema mirov bi tîpan nîşan nede, bi deme re ew deng ji holê radibin.

Kesêni ku li hemberî vê ramanê derdi-kevin jî diyar dikan ku wan dengan di nava zimanê kurdî de cihê xwe girtine. Her wiha di nava berhemân klasik de jî hatine bikaranîn, lewre dema mirov wan dengan ji nava peyvan derxe, wê xisareke mezin bigihêje zimanê kurdî. Pirani-

ya zimanzanen kurdî di vê baweriyê de ne ku divê mirov wan dengan û renge-dengan di xebatê ferhengî û zimananza-niyê de nîşan bide, lê di xebata rojane de pêwîst nake ku mirov wan dengan û renge-dengan bi tîpan bide nimandin. Her wiha dema yek pirtûkeke klasik ji tîpê erebî wergerîne ser tîpê latinî, divê wan dengan nîşan bide. Lê wekî din, di kovar û rojnameyan de pêwîst nake ku mirov wan nîşan bide.

Taybetiyêne hinek dengêr kurdî

Di zimanê kurdî de peyv bi hinek dengan dest pê nake û naqede. Li gorî ku hinek zimanzanen kurdî dibêjiin, di kurmanciya berê de peyvan bi tîpê dengdêr dest pê nekirine. Lî niha bi taybeti tîpa /a/ vê rîpîvanê (qayide) bîmpê dike. Niha di kurmancî de gelek peyvîn ku bi /a/yê dest pê dikan, hene. Her wiha gelek peyvîn ku bi dengdêra /ê/ û /î/ dest pê dikan jî hene. Kêm bin jî ji bili tîpê /u/ û /i/ peyvîn ku bi dengdêren din dest pê dikan hene. Jixwe ev her du deng, di nava peyvî de cihê xwe bi hev diguherînin. A rast dengê /u/ dibe /i/ Celadet Bedirxan di waneyen ku di kovara Hawarê de dane, diyar dike ku di kurdî de tu peyv ne bi /i/yê dest pê dike, ne jî pê diqede. Dema mirov bala xwe da fer-

hengan, mirov dibîne ku hejmara peyvîn ku bi /I/, /U/, /Ü/, /E/ dest pê dikan gelekî kêm in. Piraniya wan an peyvîn biyan in, an jî ji dirûvî xwe yê berê dûr ketine. Peyvîn wisa/wesa/ wusa bûye /ûsa/, peyva wiha/ wuha/ weha bûye /uha/. Heke mirov baş lê bikole, mirov dê bibîne ku piraniya dengêr ku bi dengdêran dest pê dikan, ji dirûvî xwe yê berê dûr ketine.

Bo nimûne:

Anîn/hanîn/hînan

Êrîş/ hêris

Arîkar/harîkar

Ewr/hewr

Avêtin/havêjtin

Ajotin/hajotin


Erê/herê

Îro/hîro

Ew mînakên ku me dan, dirûvîn xwe yê berê di hinek devokan de parastine. Lî îro gelek peyvîn ku bi dengdêran dest pê dikan hene. Ev rastî ji bo ayendeyê dikare ji me re bibe alîkar, lewre dema mirov bêgav bîmîne ku di nava gelek dirûvîn peyvekê de tercîhekê bike, mirov dikare dirûvîn ku bi dengdarê dest pê dike tercîh dike. Li gorî vê nêzîktedayînê, mirov tu carî nikare peyvîn “ûsa”, “usa” tercîh bike, divê mirov di nava “wisa”, “wesa” û “wusa” yê de tercîhekê bike.

Newroz û Yekîtiya Neteweyî

AHMET BARAÇKILIÇ



Newroz li ser xaka bav û kalêne me, bi gelê herêmê re, bi taybeti ji aliye gelên arî ve ev 2610 sal in tê pîrozkin. Wateya Newrozê û mercen pîrozkinê çi ne? Çawa dest pê kiriye û çawa hatiye afirandin? Gelek pîrsen wiha hene ku, divê mirov bersiva wan bizane. Lî divê neyê wê wateyê ku mirov piştî 2610 salan careke din, lêkolînê û lêgerîna Cejna Newrozê bike ka ev cejn ji aliye kê ve û li ser kîjan enca-man hatiye afirandin. Li ser rojekê wiha tu gumanê min jî mîna her welatperârezekî tune ne ku ez careke din rojekê wisa bidim nasandin.

Pêwîst nake ku her sal, em di daxuyaniyê xwe yê Newrozê de guftûgoyan bikin û her yek di aliye kî de bîbêje ev cejn, cejna tirkan nîn e, wele bileh ya me ye. Kesêni ku hîn di gumanê de ne ku Newroz a kîjan gelî ye, divê lêkolînê bikin.

Her dem li ser dîrokê û rojêne taybet lêkolîn gelekî girîng e. Mebesta min ew e ku em her-

sal, nebêjin ya kî ye, ne ya kî ye. Ger em hîn piştî hezar salan nîqaşî li ser dikan, ev jî qelsbûna me dide xuyakirin.

Hemû dîroknaşen farisan, ereban, sovyeta berê û yên herêmê bi dehan pirtûk nivîs-dine û dane zanîn ku ev cejn bi hezaran salan e ku tête pîrozkin. Mêtingerên tîk çend sed kes, tenê ji bo ku Newroz pîroz kirine girtine, işkence bi wan kirine, cezayên gîran dane wan û ew winda kirine? Lî di van çend salân dawî de dibêjin Newroz a me ye. Pîrsa yekemîn ew e ku divê mirov ji wan bipirse: ji bo ci we hetanî niha pîroz nedikir? Ma dîroka Newrozê berî niha bi çend salan dest pê kiriye? Kawa kî ye? Dehaq kî ye? Hûn xwedî li kîjanî derdi-kevin? Kawa pêşengê neçaran, bindestan û mazlûman e. Dehaq jî tîstên ku serkêsiya wan dikir, hûn îro bi navê dewlet û dadimendiyê bi cih tînin. Hûn Dehaqên nûjen in û kirinê wî dikan. Hûn çawa Kawa û serkeftina Kawa pîroz dikan? Ji aliye her kesî ve xuya ye ku, dewleta tîk tîstekî kurdan nas nake, dê cejna wan çawa nas bike?

Çi heyfe ku hinek gelên arî jî îro bûne dewlet, bûne Dehaq, roja mirina hovan pîroz dikan û bi xwe jî hovîtiyeke bi navê nûjeniyê, li dijî gelê ku xudanê Newrozê û neviyêne réberen Newrozê ne didomînîn.

Her çendî ku 2610 sal derbas bibe jî, ji bo gelê me ji her deme zaftir, li dijî neyarê jiyanê, azadiyê û vejinê rojekê girîng, taybet û nû ye. Ji bo me jî rojekê berxwedanê ye. Ji ber ku di vê deme de jî Dehaq hîn hene, hîn

dijîn. Divê ev roj, ji nû ve mîna Kawa bête jiyandin. Bêguman rojekê wisa ku em bi hezaran salan e li bendê û li hêviyê ne wisa bi hêsanî, yekser pêk nayê. Divê rojekê ji roja din lezir gavê dîrokî bêne avêtin ku gelê me bi dilcoşî cejna xwe ya neteweyî bi serfrazî li ser axa bav û kalêne xwe pîroz bike.

Ger di welatê me de qirkirinê Helepçe hebin, bi milyonan koçber bibin, bi hezaran dîl hebin, başî û nebaşî li gel hev, dijminê neteweya me û hevalbendêne wan pişt bidin hev, li ser axa niştimanê me, cerdevan noker û mîrkuj hebin, mixabin Newroz nabe pîroz. Ji bo pîroziya Newrozê divê hemû dilsoz, sazî, rîexistin, partî û tevger di vê Newroz 1998'an de vegerin ser doza neteweyî.

Kawayê hesinkar bi mertal û nalcûxê xwe Newroz afirand. Împaratoriya Medi li ser hîmê maşen gelan konfederasyon damezirand, seranser li ser erdnîgariya Kurdistan bi dehan û sedan serhildan pêk hatin.

Di dawiya qırna bist û yekê de, mixabin 40 milyon hîn bindest e, ji wan çend milyon ji welatê xwe hatine derxistin. Piraniya wan li guhê bajaran bêpergal, di bin konên naylon de rojekê têr, deh rojan birçî dijîn.

Li welatê me, bêken û şahî, her tiştê jiyandin. Di rojek wisa de û bersiva rojek wisa pîroz, hilgavtin, hevgirtin û dameziranda yekîtiya neteweyî ye. Bi vê hêviyê Newzoza girtiyen azadiyê, têkoşerên rizgariya neteweyî û dozdarêne yekîtiya neteweyî, bi rîz û hurmet pîroz dikim.

Qîrîna ke viran kewta, qe vîrî nêbena

Eseran de, wendoxê zankeyan zaf weş xeftiyayê û her gi roj cayê de paykewtinê viraştê. Nê paykewtinan ra jew jî, pîrozkerdina Newrozê sera hezar û newsey û newayî bi. A ser wendoxê ke welatperweriyê, zeredê Zankeyê Stenbolî de roşanê xo Newroz ebi nezdiyê di hazar merdimana pîroz û awa kerdî. Dewlet paykewtina nê Newrozî ra zaf tarsêbî ke ebi polîsanâ kewt zankeyan û o roj ra no roj nêvejiyê teber. O Newroz o zey ewroy yeno mi vîrî. Ê embazê ke, o roj wija de Newrozê xo pîroz û awa kerdî û bahdoyê awakerdina roşanê xo jî vardayinê polîsan vindarnayê, iyê weş yenê çimanê mi ver. Embazê ke na paykewtin de vinderdê polîsan rê wina vatê: "Eke şima camêrd ê, koyanê Kurdistanî de vejiyê ma vermî."

Kam şeno Emînay, Yadigarî, Îhsanî, Ayhanî, Osmanî, Çetînî, Orhanî, Xelîlî, Muslimî, Elî Îhsanî û bînan xo vîr bikero. Wendorxên ke ney qelfî de ca girotê. Lecê reyayinî de jî cayê xo bi rûmeta girotî. Kes şeno qandê ïnan zaf çî vajo û oyo bêro vatîn jî. Ez vana ney qelfî, zankeyan de, koyan de û şarî miyan de xeftiyayînê şoreşî zaf weş dayî û terso gird vistî zerya bandorkaran. Beyazit, Laleli, Aksaray, Unkapani, Taksim, Fatih, Eminönü, Kadıköy, Bakırköy û zebî ca şahîdî ke, ney qelfî rûmete xo ya ewtiyana de, serwedarnayî viraştî. Ez vana rojê wo bêro, peydegeyranî û dîrokzanî yê, weşîna nê embazan rind aşanê û iyê Newroza neway miyan de zaf ca bidê wendoxê welatperweriyê ke zankeyen Stenbol de wendê.

Îhsan Güler embazeko zaf kuşatvan û zerî veşate bi. Ma yûrdê AÖS de xeylê pê het de mendî û embazîn kerdî. Mi qe rojê jî nêdî ke, ey riyyê xo tal, yan jî tirş kerdê. Tim û tim kêtê ci ca de bi û zey mozikan embazanê xo miyan de geyrayê. Qê nézanayê cayê xo de videro. Dûrî ra merdimî qe şik néberdê ci ser ke, o şoreşger o. La belê, merdimî wexto ke nezdî ra silasnayê û biyê embazê ci, no fin ci ra zerî girotê û bawerî na girêdiyayê şoreş.


Embaz Îhsan şaristanê Argûwan ra, dewa Nermikan ra bi. Herêmê Meletî de jî malbat û bera ïnan rê vanê Nermikan. La belê Stenbol de jî dawîjê ïnan zaf bi û zafê ci jî Unkapani û Fatih de xalî rotê û hewna jî roşenê. Nika piyê ey, ded Memed jî Stenbol

de roşeno. Embazî Zankeyê Stenbol de, Fakûta Hiqûqî de wendê ke, bibo hiqûqzan. La belê Îhsanî jî, zey embazanê xo yê bînan querero gird da û şî Kurdistan. Zek yeno mi vîrî, o sera 1991'î de şî gerîlay.

Embaz îhsan verê weşîna zankeyî, kewtbi welatperweran miyan û bîbî hezkerdeyê serokateya şoreşê şarê ma. Çimke dewa ïnan Nermikan de seran ra na heta, xeftiyayinê siyasi û folklorî estbi Ciwananê na dew, kişa pêmûsnayin ra herem de, zaf veng dayê çosmeyen xo. Ciwanî dew de jîn biyê, la belê sükijan ra vîrî kewtê siyaset miyan. Na dew ra zaf ciwanî şiyê gerîlay û çend embazî jî şehîd kewtê. Ê embazan ra jew jî Hecî bi. Hecî Sêwaz de, Güler Otaça piya, 29'ê Ekîma 1996'an de şehîd kewt.

Embaz îhsan hewna ciwan bi, la belê goreyê seranê xo, zaf çî misabi. Eke wendoxê welatperweran miyan de beno û eke wendoxê çepê tirkan miyan de beno, hetê zanayin ra cayê ey babatna asa yê. Raşt û çewtinanê weşin, bi zanayin jew bi jew ardê pê hetek. Mêjge ci zaf pratîk bi, coka jî zeyanê ke weşin ra dayê û analîz kerdê, zaf ümûşê fikranê ci biyê. Eke rojew ra, eke dîrok ra beno, jew biyinê yan jî jew teşxeleyê wexto ke ardê werte; diyinanê xo bi dialetîka dewisnayê. Zewbî jî zaf humanîst bi. Zek ma vajê, wexto ke, Helepçe ardê ziwan, jenosidê fileyan jî, jenosidê cihûdiyan jî, ê Hiroshima û Negazakî sero jî vinderdê. Ey qandê weşîna şarê bînan jî xo zaf tewnayê û merdimateya xo miyan de jî çend ke şayê, bi zerya pakina ardê ziwan.

Embaz Îhsan zey şarê xo, şarê bînan ra jî û verê hemînan jî şarê tirkan ra hez kerdê. Ey qandê şarê ma û ê tirkâr wina vatê: "Şarê ma û şarê tirkan no herêm de zey di birayan ümûşê pê benê. Wexto ke dewleta Roma Res, ïnan ra dûrî kewno, mabênenî ïnan de qe meselê nêvejiyeno. La belê ci wext ke na dewlet, destê xo berzê weşîna ïnan keno, zaf nêbo jî pê tewnenê. Fina jî nê tewnayînanê xo, qandê xatirdê embiryayin û biratey rew xo vîr kenê. Ci heyf o ke, hergi fin jî şarê ma kurdan na biratey ra, çiwe werdo û dirbetin mendo. Çend ke ma kurdî, bi lec kerdina yenê zanayin jî, na diyin qe raşt niya. Ez vana dinya de jew şar jî, hindê şarê ma bêwayir, fiqare û zerîpakin niyo. Mayê newe newe goreyê diyinê dinyay kombenê, hêzên xo anê pê ser û neteweyê xo de



benê jew gan. Ma çend ke rew kombê, hind rew jî şoreşê ma wo awa bo."

Embazo delal û birûmet, Îhsan Güler, Kurdistan de veşî weş nêmend. sera 1992'în de 7'ê menga rezber de, teberdê şarîstanâ Gole de, jew vardayînê hêzên artêsa Tirkiya de 21 embazê xo ya şehîd kewt. Dewlet sîfte 4 gerîla weş tepşeno. Nînan rê zaf işkence keno. Bahdo jî cayê 18 embazân newî kifş kenê. Hêzên artêsa tirk, bi çekanê giraniya kewnê çosmedê nê embazanê newî û danê gulan ver. Bahdoyê na verdayîn, 4 êsîran jî ebi işkenceya kişenê.

Ê rojan de, Serhad de na qetliam rew vila bî. Komela mafîn Merdiman û wekilê partiya DEP'an qetliam vetî wertê. Wekilê Amedî Hatip Dicleyi qetliam, meclîse Tirkiya de ard rojew. Wezîrê Karê Zereyê Tirkiya İsmet Sezgîni na vardayina bêrûmet û qetliam meclîsa xo de wina ard ziwan: "Hêzên artêsa ma, 22 terorîşti kişî. Meyîte nê terorîstan, viran sûka Gole

miyan de çarnayî. Ma qandê silasnayînîn, ìna viran müsnayî şarî. Di rojî têpya boy kewt meyitan. Coka nê meyîfi pê sero, teberdê Gole de, nezdiyê mezelanê dewa Şeref de dayî her. Nînan ra 6 meyîfi bê sunet bi, coka merasimê dînî nêvirazya û bênimaz hêwadyayî." Wezîrê mafîn merdiman, wekilê Amedî û merdimo kurd, Mehmet Kahramanî jî fikrê xo, jew pers sero wina ard ziwan: "Eke şima dest de bîlgeyê esto, biyarê ez jî mesel sero vindî." Wezîrê Mafîn Merdiman Mehmet Kahramanî jî, goreyê qiweta xo, qetliam û wahsatê Tirkiya nimitê.


Bahdoyê na qetliam malbatê gerîlay şî herêm ke, meyîte qeçikanê xo bigîrê. La belê dewleta Tirkiya nê malbatî sîfte tepişti û eyşti binçim. Ü bahdo jî dayî işkence û herêm ra qewrnayî. Qîrîn viran kewt koyan, qe vîr bêna; vaje?

□ 17 adar 1998:

PKK cara yekemîn agirbesta yekalî ilan kir

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, li Gelyê Bekaaya Lubnanê li gundê Bar-Eliasê li hemberî çapemenî û TV'yên tirk Ji bo ku ji 20'ê adarê heta 15'ê avrûlê bidome, agirbesteke yekalî ji bo 25 rojan flan kir. Di civînê de Serokê YNK'ê Celal Talabani jî li tenîşa Öcalan rûniştibû. Di 25 rojê agirbeste de ji hêla gerîlayen ARGK'ê ve bi tenê guleyek jî nehat tecandin, lê dewleta tirk guh neda agirbeste û bi dehan gund vala kîrin û êris bir ser gelek şervanê kurd.

BÜYERİNE Jİ DİROKÊ




□ 16 adar 1988:

Qetliama Helebçeyê

Saddam Huseyin rojê 14/15 û 16'ê adara 1988'an de navçeya Helebçeyê û çend navçeyen din bi gazê kîmyewî bombebaran kir. Di vê bombebara na jehrî de 5 hezar kurd mirin, bi deh hezaran jî an birîndar bûn an jî se-qet man. Ev qetliama wekî yên berê li ber çavêr raya gişî ya cihanê çêbû lê mixabin tu deng ji wan derneket. Pişti vê bûyerê bi çend salan dagirkeran vê carê li bakurê welêt rûyê xwe yê gemarî eşkere kir û heman bombe-yen kîmyewî ji hêla dewleta romî ve li ser kurdan hate bikaranîn.

ÇAVDÊRÎ



Doza kurdî her roj
geştir dibe

MİRHEM YİĞİT

R oja 1/3/1998'an bi beşdariyeke di ser 120 rewşenbir û siyasiyên kurd ji her car parçen Kurdistanê, li bajarê Stokholmê ji bo kongreya neteweyî civînek mezin hate lidarxistin. Birêveber û berpirsiyarê vê civînê komîteyeke pêncesî bû, ku di civîneke derbasbûyi de cardî li Stokholmê û roja 1/2/1998'an bi pêşengiya endamê Komiteya Amadekar ya Kongreya Neteweyî Hesen Qazî hatibû avakirin. 22'ye vê mehê jî yanî roja 22/3/1998' an cardî li ser Kongreya Neteweyî dê civîneke ji yên heta niha bûyî pir mezintir û bi beşdariyek ji awira rêxistin û hejmarê de hê jî ren-garengtir li dar bikeve.

Belê, di nav zemanekî ew çendî kurt de, bi tenê li paytextê Swêdê sê caran kurd têr û dê bêr ba hev, ji bo yekîtiya xwe munaqše bikin, siyaset û stratejiyên xwe bikin yek û hêz û karîna xwe kenalîzeyê xîzmeta serxwebûn û azadiya neteweyî bikin. Rast e, asteng hene. Faktorêni li dijî yekîtiyê hene. Dijmin û neyârên me, ji van astengan berdewam xurt dîkin û çendî dikarin ji bo kurd du keviran daneyînin ser hev, ci ji destê wan tê dîkin. Di nav me de ji kes û rêxistinê têr lîstika dijmin hê jî pişî ewqas serpêhatî û astengîyan pêde dîkin. Astengîn ideolojik û siyasi, yên programî û têkiliya wan bi perwerdekariya siyasi û şexsiyetê re jî hene, pir caran roleke neyînî digirin ser xwe.

Li tişte xuya ew e ku, bi ser van gişan de jî û astengî û dijwarî çawa dibin bila bibin, dagirker û neyâr çendî dirindetir û xwînrêjtir dibin û çendî pesin û fortê xwe didin, bi kîfa xwe ne, belê kurd bi lez û bi gavên bixwebawer li sala 2000'î diqedimin û wa xuya ye ku ji bo ku mesela yekîtiya xwe nehêlin sedsala 21'ê ew xwedî bir-yar in.

Bayekî nuh li bayê û giş delîlî û berjengên berçav, qonax û zemanekî nuh destnîşan dîkin.

Meseleya kurdan ji zû de ji meseleya parçeyekî derketiye. Kultura Kevin Hildiweşê, statûkoya heye qırçeqirç lê ketiye û êdî ne dagirk-erîn tirk belê tu hêz hew kare kurdan bi jêrdestiya qîman razî bike.

Kurd ji ber rewş û statukoya xwe nerehet in, bi hêr in. Ji ber vê jî di cihê xe de nasekinin û ne bi tenê li welêt di nav teverê de ne, serîhildane û ketina nav cenga man û nemanê. Li vir, li derveyî welêt jî neteweyeye çalak û biruh e. Ev ne mîna hev bin û li gorî welatên Ewrûpayê hinekî ferq bike jî, kêm zêde li her deverê wiha ye. Ewrûpî jî vê dibînîn û dibêjin.

Tu ji kîjan alî ve li rewşa kurdan binêre mirov lebit û liveke nuh dibîne. Dabaşen munaqše, zimanê guftûgoyan û bi giştî mijûlahiya mirov kurd sal bi sal neteweyîtir û watedartir dike û evneteweyîbûn iro ji her car kûrtir û rasyoneltir ê. Kongreya Neteweyî êdî ne bi tenê mîna fikrekê ketiye rê.

Li biyanistanê û li Ewrûpa serê karwêne PDKW dikşîne. Karwan ji awira beşdariya rêxistinan, şexsiyetên navdar û xwedî tecrûbe, ji awira dereca piştgiriya gel û çalakiyên Kongreya Neteweyî ve ji bo wan dibe navnişan, hêviyeke mezin çedike û bûye kaniyeke moral û baweriya bi şoreşa Bakur û serokatiya wê.



tin hilbijartin, dê birêveberiya "Koma Medya" yê jî bikin.

Di dawiya civînê de, li ser navê şaxê Gabara Çiyan daxuyaniyek da: "Ji bo qalkirina çalakiyên şanoyî û sînemayî yê li Welêt û li derveyî welêt û zanyariyên (agahî) teorîk, em difikirin ku kovareke şanoyî û sînemayî derxînin. Ji bo vê dê bi birêveberên Înstituyê re bê qisekirin.

Em ê bi piştgiriya Înstituyê bibin alîkarê hunermendê kurd, ku filmên wan bêr nîşandan, lîstikên wan bêr listin û pirtûkên wan bêr weşandin. Ji bilî vê, em ê xwe bigihêjinin tevayî şanoger û sînemegerên kurdan û dezge-hêñ şanoyî û sînemayî. Kesênu ku bixwazin bi me re bixebeitin, dê deriyêne me ji bo xebatên wisa vekirî bin. Li wan dê bê guhdarîkîrin, dî-tinê wan li ber çavan dê bêr girtin. Em ê alî-kariya dezgehêñ kurdan yê mîna MED-TV ji awira (alî) hunerî ve bikin."

Wisa hate diyarkirin ku, di demeke kin de, dê programma xebatê bê nivîsandin. Program ji tevayî hunermend, dezgehêñ hunerî û çapê-medya kurdan re dê bê sandin. Kesênu ku bixwazin têkiliyên bi vê şaxê re deynin dikarin, bi riya telefona Înstituyê "46-8 6523429", an jî navnîşana wê "Kurdiska Institutet, Fridhemsg, 15,112 40 Stockholm-Sweden" têkiliyê deynin.

A. WELAT/ STOCKHOLM

Ji Stockholmê gaveke hunerî: Şaxa şano û sînemê hatin avakirin

Înstituya Kurdî ya Stockholmê di bin banê xwe de şaxa şano û sînemayê saz kir. Her wiha bi navê Koma Medya komeke şanoyê jî hate avakirin. Rêveberên şaxê, hemû şanoger û sînemagerên kurd ji bo xebatê vexwendin û diyar kir ku, ew dê alîkariya saziyên mîna MED TV'yê bikin

Înstituya Kurdî li Stockholmê vê carê hem-bêza xwe ji humermendê kurdan re vekir. Hejmarek şanoger û sînemagerê vexwendin civînê û li wir bi însiyatîfa şanoger û sînemagerên kurd şaxeke nû, "Şaxa Şanoyî û Sînemayî" ava kir. Pişti avakirina vê şaxê, bi navê "Koma Medya" komeke şanoyê jî hate avakirin.

Di destpêka civînê de, li ser navê Înstituyê Mîrhem Yiğit, axaftineke kin û bi wate kir. Bi kinahî, bala beşdaran bir ser nîxêne karen hûnerî û rola wê di civatê de. Yiğit, axaftina xwe wiha bi dawî anî: "Înstituya me dê bibe alîkariye hunermendê kurd. Biryarên we dê bê piştgiri nemîne."

Peyre birêvebirê civînê, rejîsorê kurd Mehdi Caf, dest bi axaftina xwe kir: "Armanca me, di hundîre Înstituyê de, vekirina şaxeke hûnerî an ku şano û sînemayî ye. Pêwîst e, di şerî iro de, hûner jî barê xwe hilgire ser milê xwe û derd û kesera gelê me bîne zîmîn." Pişti axaftina Mehdi Caf, beşdar derbasî ser pîrsî programma xebatê bûn. Program, pişti munaqšeyan hate serrastkirin.

Li gorî programê, penc kes ji bo birêvebirîna şaxê hatin hilbijartin. Kesênu birêvebir ev in: Rejîsor Mehdi Caf, nîvîskarê lîstikên şanoyê-rojnamevan Gabar Çiyan, derhêner û lîstikyanê şanoyê Kemal Görgü, şanoger Hamîd Duradî û hunermend Hasan Ebdo. Kesênu ha-

Zerdeşt Haco:

PEN'a Kurd

✓ Ew ne karekî hêsan bû, ku PEN'a Kurdî were avakirin. Ji ber gelek rêxistinê din ên nivîskaran, wekî nivîskarê filîstînî, ku bi navê PEN'ê, dixwestin bikevin nav PEN'ê, heta bi dest wan ve nehatiye, ji ber ku mercen endamtiyê yên PEN'ê heta niha pêk neanîne. Yanî cihê şanaziyê û cihê dilşahiyeke mezin e.

PEN ci ye, di kîjan warî de dixebe û wezifeyên wê ci ne?

♦ Ez dixwazim pêşî bibêjim, ku PEN'a navneteweyî, di sala 1925'an li paytextê İngilistanê, li bajarê Londonê hatiye damezrandin. PEN, her sê tipen pêşî navê rêxistineke nivîskaran dide xuyakirin, ku di nav vê rêxistinê de nivîskaran gelek neteweyen gihane hev û dixwazin gotina azad an jî bîr û baweriyan azad bi hev biguherînin. Ev nivîskar, dixwazin berhemên xwe bixin bin xizmeta mirovahiyê, da ku bêhtir mirovahî li cihanê pêk were û demokrasî jî bi pêş bikeve.

PEN'a Kurd kengî ava bûye, li ku derê çêbûye, ji aliyê kê ve hatiye damezrandin? Ci kar û xebat pêk anîn?

♦ Berî vê xebatê, xebateke gelekî mezin, di çavê min de ji aliyê kekê Hiseyin Erdem ve hate kirin. Ew ne karekî hêsan bû, ku PEN'a Kurdî were avakirin. Ji ber gelek rêxistinê din ên nivîskaran, wekî nivîskarê filîstînî, ku bi navê PEN'ê, dixwestin bikevin nav PEN'ê, heta bi dest wan ve nehatiye, ji ber ku mercen endamtiyê yên PEN'ê heta niha pêk neanîne. Yanî cihê şanaziyê û cihê dilşahiyeke mezin e, ku PEN'a Kurd hate avakirin, ew jî bi destê kek Hiseyin Erdem, ku di çavê min de, bi rastî gelek bi qedr û qîmet e, pêk hatiye. Heta niha belkî rêxistin û partîyen kurdan nikaribûn karekî wiha bi destê xwe ve bînîn, lê vî mirovî hanê ev karê mezin ji gelê xwe re kir, ez gelekî xweşik dibînim û ez gelekî spasiya wî dikim.

Ev PEN'a ku li Berlinê hatiye damezrandin, berdewama PEN'a kevin e, yan yeke nû ye?

♦ Nexîr, ew PEN bi xwe ye. Ji ber ku PEN'a Kurd, li gorî biryara PEN'a navneteweyî li Meksîko hatibû betalkirin, diviyabû komîteyeke amadekirîyê ji bo kongreya nûbihata çêkirin û ew komîte bi pêşniyaza Dr. Hiseyin Habeş, ku wî navê min û navê keke Heyder Işik dabû, li gorî pêşniyaza kek

ber ku ne li gorî rêznameya PEN'ê gelek xelk dûr kirine, ji PEN'ê derxistin. Di rêznameya PEN ê de tê nivîsandin, dibêje: "Ew kesê ku ziyanê bide PEN'ê divê ew mirov ji PEN'ê were derxisti." Di çavê min de kesê, ku endametiya xwe nedabin û di rîbaza de bendek nebe, bêje ew kes gerek were derxistin û mirov wan kesan derxe û here ji PEN'a navneteweyî re binivise, bêje, ev kesê hanê PEN birine û xistine bin siyâ partiyeke, ku di çavê rîzaniya (siyaset) Ewrûpa-rojava de, partiyeke ne li gorî bîr û baweriya wan, ne li riya siyaseta wan, bi çavekî din lê dimeyzînin û xwestiye, yanî hiştiye, ku PEN'a Kurd ji bikeve wê qurçikê de, ku bi wî çavî lê were meyzandin, ji bona ku xebata PEN'a Kurd were betalkirin. Xwezi kekê Dr. Hiseyin Habeş, ev karê hanê nekiriba, berê hatiba bi me re rûniştiba, kêm û kurtiyêñ ku hebûn bi me re li kongreyê li ser behs kiriba. Min ev yekê hanê, di kongreyê de jî got, heger mirov bixwaze xebatekê bi pêş ve bibe, bila were di nav xelkê de rûne û bêje, min tiştek teslimî we kir û we ne li gorî ku min ji we re pêşniyaz kiribû kir. Gerek e, destê xwe bixistana çavê me û di nav kongre de gotiba, we ev û ev ne rast gotiye.

Dema Dr. Habeş berpirsiyar bû, xebata PEN'ê baş dimeşîya? Xebatên wî yen berê çawa bûn?

♦ Bi rastî jî, wextê ku PEN kete destê kekê Dr. Hiseyin Habeş, mixabin ew nameyên, ku min jê re nivîsandibûn, ku mirov wan bixwîne yanî ji ber heta hingî min gelek bi dilxwesi jê re dinivîsand. Lî, piştî ku ew name şande navenda PEN'a navneteweyî, ango ez mecbûr im niha bêjîm ku, tiştin gelek şas bûne. Di kongreyê de, kekê Dr. Hiseyin Habeş hazır, min dê ev yeka hanê jî jê re bigota, ji ber di her sê salê, ku ew serokê PEN'a Kurd bû, nameyek ji me kesî re nehat û me tu dengûbasê PEN'a kurd nebîhistin. Di wextê xwe de, ji Hiseyin Erdem ji me gelek caran nedibîhist, lê piştî ku em dihatin kongreyê, me didît, di kurmancî de dibêjin; "devê me digiha piştî guhê me" tiştî ku me paşî ji kekê Dr. Hiseyin Habeş bi



hîst ew bû. Li gorî biryara, ku li Meksîko hatiye standin, PEN'a kurd hatiye betalkirin. Ew jî ji ber ku endametiya PEN'a Kurd ji bo PEN'a navneteweyî neçûye û li gorî vê yekê hinek hevalên din, yên ku di serokatiyê de bûn, bi kekê Dr. Hiseyin Habeş re ji serokayetiye kişandibûn û Hiseyin Habeş bi serê xwe mabû û li gorî rêznameyê yekî teñê çenabe serokê PEN ê bimîne. Ji ber vê yekê riya wî nemabû ku, serok bimîne. Meçbûr ma ku xwe vekişine.

Ev alozî û nexweşî çawa peyda bûn?

♦ Ji ber vê komîteye ku, ji bo amadekirîna kongreyê hatibû pêşniyazkîrin, ku ne tenê ez û kekê Heyder Işik bûn, hinek hevalên din, ku ez bi xwe wan nas nakim bi rastî, kekê Heyder Işik bi wan re rûniştibû, komîteye çê-

dilşahiyeye mezin e

✓ Eger endamekî/e kongreyê bigota: "Ez vî kesê hanê qebûl nakim", Ji ber çi hoyî be, hingî ew mirov nedihat wergirtin. Ev dide xuyakirin, ku kongreya PEN'a Kurd bi rastî bi hemû rihê demokrasiyê hate kirin, yanî kesek nikare bibêje ku, ew kongre di bin giraniya rêxistîneke siyasî de çêbû.

de bûn di nava kongre de jî bûne endam
33 kes bûn. Heşt kes ji endamên berê
amade bûn.

Di nav PEN'a Kurd de rêveberiye-ke demokratîk heye?

◆ Ez dixwazim mînakeke bidim.
Kongreya me bi riyeke gelek xweşik û demokratik çêbû, bi rêkûpêki bû. Eger endamekî/e tenê bigota: "Ez vî kesê hanê qebûl nakim" Ji ber çi hoyî be, hingî ew mirov wekî endam nedihat wergirtin. Ev dide xuyakirin, ku kongreya PEN'a Kurd bi rasti bi hemû rihê demokrasiyê hate kirin, yanî kesek nikare bibêje ku, ew kongre di bin giraniya rêxistineke rêzanî de çêbû, yanjî di destê hinekan li ser hebû, ew kesê ku vî tiştê hanê bibêje, derewan li xwe dike û dereweke dixe dinyayê de. Bila ev rasti were zanîn.

*Di bin bana PEN'a Kurd de komîs-
yonêñ çawa hene?*

• Ji bona ku kar nekeve ser milê mirovekû/e yan du sê mirovan, di navâ kongreyê de komiteyên din hatin hilbijartîn. Komîteyek ji bo nivîskarêñ di zîndanan de, komîteyek ji bo aştiyê, komîteyek ji bo nivîskarêñ jin û komîteyek jî ji bo wergerandin û kar û barêñ lînguîstikê yan jî kar û barêñ zimannasiyê. Ji bona ku ew komîte xebatê bikin, heta ku mafê hemû gelan, hemû neteweyan di warê zimannasiyê, di warê lînguîstik û wergerandinê de were parastin û were pêşye birin.

kirîbûn, ji bo ku ji nivîskaran re nameyan bişînin. Ji ber ku danûstandin di navbera min û kekê Heyder Işık de çebû, bêyî ku em bibêjin ev kesên hanê ji filan riya siyasî ne, yanî em di nav xwe de li hev hatin ku mirovekê ne xayînê neteweya kurd be, ne li dijî neteweya kurd be, her mirovekî/e kurd, ku berhemê wî/wê yêñ wêjeyî, hunerî hebin, mafê wî heye ku were û li wê kongreyê amade bibe û bibe endamê PEN'a kurd. Li ser vê yêkê em li hev hatibûn. Wê komîteya, ku hatibû çêkirin û name şandin ji nivîskaran re, ji kê re şandin, ji kê re neşandin, yanî min li kongreyê ji got, ew di bin çavêن min re derbas nebûn bi rastî. Di rojnameya Özgür Politikayê de, listeya navêن nivîskaran derdiket, lê ji ber ku ez baş bi tirkî nizanim, ji ber vê yekê ez nizanim ji kê re çûn, ji kê re neçûn. Ew kesên, ku ama-

li cîhanê belav bibe.

*Mamoste, hûn dizanin saziyeke din
bi navê Yekîtiya Nivîskarêñ Kurdistan
heye. Çi cudatî di navbara her-
du saziyan de heye û wê têkiliyêñ we
bi hev re çawa bin?*

◆ Belê, Yekîtiya Nivîskarêñ Kur-distanê yekîtiyeke neteweyî ye ango li mafêñ nivîskarêñ kurd, di nava Kurdishanê de digere û mafêñ wan diparêze û alîkariya wan digihîne hev û dixwaze, ku ew hev û din nas bikin, peywendî û têkîliyên wan bi hev re çêbibin. Heta ku çanda gelê kurd û civaka gelê kurd bi awayekî demokratîk û mirovayetî bi pêş ve here.

Navenda PEN'a Kurd ew e, ku ne
tenê li ser tenga (sewiye) Kurdistanê, li
ser bilindahiya neteweya kurd, belê li
ser tenga navneteweyî, yan ku peywen-
diyên PEN'a Kurd, nivîskarêñ kurd bi
PEN'êñ neteweyêñ din re bibin, ku ni-
vîskarêñ kurd bi nivîskarêñ neteweyêñ
din re xebatê bikin. Ev hemû ji bo goti-
na azad, peyva azad, ji bo bîr û bawer-
iyêñ azad li cîhanê bêhtir bi pêş ve he-
rin, bêhtir belav bibin têñ kirin.. Yanî
ji bo ku ez bêjim, nîvişkê mîjiyê nete-
weya kurd ku di bîr û baweriya min de
nivîskarêñ kurd, rewşenbirêñ kurd der-
dixin, bikeve nav rewta rewşenbirêñ cî-
hanê, ku bi hev re xebat were kirin.

*Mamoste, şertên endamtiyê ci ne?
Yekî ku bixwaze bibe endamê PEN'ê,
kijan wesfên wî gerek hebin?*

♦ Li gorî rêznameya PEN'a Kurd, her mirovekî/e, ku pîşeya wî nivîskarî be, yan rojnamevan be, yan wergêr be yan jî weşanger be, ev kesên hanê di PEN'a kurdan de dikarin bibin endam. Ev komela berî her tiştî ya nivîskaran e. Gerek e, berhemên wan hebin, gerek e her kesekî ku bixwaze bibe endamê PEN'a Kurd berhemên wî/wê hatibe capkirin.

*PEN'a Kurd ji bo salekê çi proje
yan jî kar û bar xistiye pêşîya xwe, ku
pêk bîne?*

⇒ Berî her tiştî divê xebateke dij-war were kirin. Divê em bi awayekî

demokratik û bi awayekî hevaltî û aştî em van endamên PEN'a navneteweyî têbigihênin, ku ev nîqa ku ketiye siku-ra PEN'a Kurd ne tiştekî rast e. Bi rastî şâsiyeke gelekî mezîn e. Em hemû dizanîn, derewek dikeve dînyayê de, heta ku mirov karibe wê derewê ji din-yyayê derxe, karekî gelek zor e. Ez hêvî dikim ku, em karibin bi xebata xwe ya demokrat ji navenda PEN'a navnetewî re bi xebat û bi kar bidin xuyakirin ku, bi rastî em mirovên demokrat in û bi rastî em bi tu partî û rexên siyasi ve ne girêdayî ne, ku ev PEN'a Kurd tenê PEN'a wan nivîskar û rewşenbîrên kurd e yên bê-alî ne. Ev komîteya ku hatiye hilbijartin, ji bo sê salan hatiye hilbijartin, ez dixwazim bêjim, ku piştî kongreyê civîna pêşî ya komîteya birê-veberina PEN'ê bi hev re rûniştine û cî-vînek kirive heta niha.

Di civina pêşıya me de, me daye ber çavê xwe ku em weşanekê derxin bi navê PEN'a Kurd, ku tê de were xuya-kirin her sê meh ci xebat dibe, ci xebat nabe, ku peywendi were kirin bi navendê PEN ên navnetewî ên din re, ku em rewşa xwe bidin xuyakirin, ku komîte-yeke nû hatiye hilbijartin. Di nava wê civînê de kar û bar hate belavkirin, kî divê ci bike û kî divê ci neke; divê da-nûstandin bi her çar komîteyên, ku ha-tine hilbijartin, çawa be. Divê protokol were çapkirin û li endaman were belav-kirin, heta ku ew jî vê yekê bibînin û zanibin ku ne tenê protokola kongreyê li gorî protokola civîna pêşî ya komîta birêvebir jî wê xebat li gorî wê were ki-rin.

Ez hêvîdar im, ku di pêşerojê de em hemû bi hev re bikevine nav xebatê, da ku xebat ne li ser milê yekî tenê be. Mebesta me ji ev bu, ku bi ruhekî demokrat û bi biratî, ev PEN'a hanê bibe bi rastî PEN'eke bêteref ji bo hemû ni-vîskarên kurd, heta ku em karibin ji her kesî re bidine çikandin, ıspat bikin ku em PEN'eke demokrat in û bi tu kesî ve ne girêdayî ne.

Evîn
Di destpêka berbanga sibê de
Teqandina berikekê bû
Di kûrahiya daristanan de
Bi dengekî hawar
Û tililiyên serxwebûnê ne
Li vî warî

Evîn
Çirûsekeke stêrka birgonek e
Ji nava bilindahiya reşahiyê
Di nava gola jehrê de veşarî dimîne
Xwe davêje nava gola xwînê
Dibe bi hezaran, deh hezeran, milyonan
û mirovahîyeke nuh gul vedide
Gazî ronahiya nuh dike
Bi evîndariyeke nuh
Ji Kurdistana nuh
Lehiyên hêviyên nûjen dişipin
Alav bi alav

Ev agir ê kê ye?
Ku netefiyaye seranserî hebûnê
Agirê dilê min e
Di nava rehênen min de digere şîp şîp
Li nav her weslén min de dişope
De zû hilbe agir êdî
Bisojîne
Bütik li benda te ne
Tovê jiyanê li hêviya te ye
Ez diqîrim te agir
Alav birjîne li her derê
Dê sorgul vebin
Û sira azadiya bê her deverê
Kaniya evînê ye, tolhildana me
Di nava sotênen sincirok de şîn dibe
Qêrîna min gihîştiye hemû guhan
Nemiriyên min hemû çav tîji kirine
Gerdûn biweşînim
Ji bo evîna te, ne bes e!
Qîrîna mezin bikim tolhildana te
hindik e
Lewre dizanim
Hawar û qîrîn para me maye

Li Helebçe
Agirê dayika welidandina Egîta ye
Ev war nakeve reşahiyê
Vî warî qet serî dananî
Li hemberî dijminê evînê
Çeka mirovahî
Û baweriya felekê
Dananî
Bombeya azadiyê
Di nav sorgulan de hembêz kiriye
Tu warê şérîn
Riya meşa welat i
Te hembêz dikim Helebçe
Ta ku tu rabî
Di milê min de
Em reqsa evîna jînê bikin
Şenî şenî li banê gerdûn
Û alem temâşevanê me be, bi dilvîni
Tu di milê min de
Ez di dilê te de, em
Biweşînim tovê evînê
Li binê liben jehrê hebo hebo
Ta li xaka gerdûn
Gav bi gav

Jiyan
Ne bi evînek har be pêl nade
Di nava behra mirinê de
Ne pêldarê evînê bî
Wekî carek ji tim caran distîn
Te ji te digirin
Li ber çavên te
û diavêjin tarîtiya kûr
Kes nabihîze
Evîna te

Baskikestî dimîne
Melûl melûl stûxwar
Li ber dîwanan
Dimîni li pey tîrêjeke rojê
Ta bê biwelide
Te jî kezeb û dila bisincirîne
Çend tîrêjîn rojê diketin para me
Şerê me yî kûr
Li hemberî tarîtiya mirinê bû
Şerê me yê kûr, bi esir deman
Her dem
Sewta beyana nûjeniyê bû
Ev jiyan û ev war
Di nava lehiyên dîrokê de herikî iro

Şeveqa Helebçe bazdaye
Şerê hovîtiyê her kes
Îro li cihanê kes nemaye hawar, hawar
Navgazîna Helevçê, ew vala ye
Tenê em tê de mane bi mirina xwe
bi xemgîniya xwe
Û ronahiya xwe-
Li dora agirê xwe yî bi sot û dijwar
Wesle bi wesle
Qet hilma te, ji te standine ey mehlûq!
Di hembêza evîna te de
Tu qet bûyî peyker
Di şérînahiya xewnîn xwe de
Tu ji te standine
Tu ji Heleçpê standine
Te ji nava axê
Bêhna jînê kışandiye pişikên xwe
Ser dev li ser erde
Tu noqî gola behra jehrê bûyî
Mehlûq

Hêstir dîbarînin çem bi çem
Çiya dîsa bi xem û kulan birîn in
Deng vedidin bi hev re
Êdî bes e!..
Û dîrok rawestiya
Bi sonda hebûnê
Ta tolhildana evînê
Û evîna tolhildanê hebe
Ez dilvînê te me
Lewre tu sorguleke ji gulistana
Tolhildan evîna min i
Tu Janeke kûr
Ji janêni jiyana şoreşa
Welatê min i
Ne mirin î bê mirin î Helepçe

Çubû ji dûr ve
Çükêk mabû biyan
Li nav çol û daristanê
Di nava refen nûhatiyan de
Bi şev mabû li derive
Mabû mevânî
Nêzî beyana zû ve
Firîya hat mala xwe
Li ser siwérnekê danî
Çikînek evînî kir
Li der û dorê nêrî
Kes tune ji wê pê de
Bi eşq û şewqek giran
Kilama xwe diqedand
Ji nişka ve xwe avêt
Hêlinâ xwe yê delal
Di karê xemilandina
Hêlinan qîzîn de bû
Ku bibûna bûk ew jî
Bibûna xwedî têjik

Bûye peyker
Li wir
Em li ber barana janbarînê man
Teyroka agir li ser dilê me kir
Lê tovê me
Bi alawa evînê hatiye hûnandin
Li kolanen Helebçe
Evîndarêni piresrêni dirêjin em
Te hembêz dikim dîsa

Min rahişt geza nan
Di nava tiliyên min de
Bû qumatka zarokeke hiskûyî
Min rakir şerbiyeke avê
Ji Sîrwan dagirt
Li ser devê min, li min bû behra jehrê
Jê fûriyan hawarêni Helebçe
Min got ez li Helebçe bijim
Sireke mirinê li min xist
Nîgen min ziwa bûn
Milén min ziwa bûn
Ez ziwa bûm
Lewre ez bûbûm peyker

Lê kaniyên welatê me ziwa nabin
Her evîna jînê şîn dice
Ma tu nizanî jehrkar
Di behra jehrê de
Tu dixeniqî jehrkar
Lewre
Dilê min kaniya jînê
Mezrabotan, dergîsa mirovahî
Behra evînê ye

Deheqo
Ên li te didin gerandin zêde bûn
Di vê esra hîn rûres û lawaz de
Lê tu di gora xwe de
Wan bizêyi ji
Xan bikî xwînxwarek
Li ser meşîyê me jî
Di bin liben jehrâ mirinê de em
Kaniya jiyanê ne, vejîkarê jîne
Roja germahîya tovê hebûnê

Roj ji nava newalên Zagros
Parî bi parî tîrêjîn xwe dişîne
Ser wareşen tiyê ronahiye
Ref bi refen bazan diherikin
Sotik bi satik rojê barkirinê
Li nava milen xwe
Bi şîpâ birûsekê diherikin
Deşt û bajar, newal û gelî
Dê ronahî bibin
Alav bi alav bixemile bejna te
Xweşik bibe her dever, bibe guldank
Bibe rehênen xwînê ji jîkarêni Helebçe

Em noqî bihuştâ xeyalên xwe dibin
Devkeniya me ganê mirovahî ey

Di dilê me de
Agirê evînan gur bû
Ji bû hilwege kela dij evînê
Alav da çirûsk
Ta ku li ser axê û zinaran
Kulikên evînê vebin
Ta bi ta

Êdî
Di nava kirâsen bûkane de
Di bazdana hembêz kirina
Dilvînê xwe de
Di milê mirinê de
Evîneke baskikestî
Tov jînbarikirina agireki gur e
Her dem HELEBÇE

MEM BOTANI

Evîna min Helepçe

Tu ji dibêjî: Ez evîndarê jînê me?
Lê tenê desten me
Dighêjin birînê me
Gewriyên me
Ji hev û du hawarê dixwazin
Û di nava qermûcêkên
Lêvîn xwe de em
Ava jînê dikişinîn taxen Helebçe
Ku lêvîn zarokan
Û gewriyan wan, ax ez qurban
Û dilen wan
Û çavên wan
Û serê wan, ax serê wan
Û destê wan tiliyên wan
Û birûyên wan, bijangên wan
Ji jehra mirinê
Bên gûstîn
Ku bâblîsoka ramûsanen jînbarînê hatin
Her ramûsan
Bira li cihen xwe rûnîn
Deymin û bilzîn
Weki pirpirokên biharê
Wisa rengîn rengîn û zérîn birgonek
Ne weki encama Mem û Zîn
Şerê keda piroz me digihîne dev
Em rîça evîna har in
Û wê dimeşin
Sotikê te diarîne, diarîne
Evîn, wek dilopek agir dixurice nav dilê
min

Ji Helebçe
Bi zarîn e, bi zarîn e
Dar û zevî melûl melûl dimeyzin
Daristan bi şîn in

Tebîn: Ji ber ku helbest gelekî dirêj bû, me du bes jê neweşandin.

● 14 adar 1998 şemf: Konsera Koma Agirê Jiyan, saet:14:00

Ji Teatra Jiyana Nû lîstika bi navê "Komara dînan: Şermola", saet:17:30

● 15 adar 1998 yekşem:

Ji KAYY-DER'ê koma muzikê "Dengê Birafî" konser, saet:14:00 Ji Teatra Jiyana Nû lîstika bi navê "Komara Dînan: Şermola, saet:17:30

● 18 adar 1998 çarşem:

Dîrokzan Torfî li ser navê Enstîtuya Kurdi bi navê "Qazî Muhammed" semînerekê pêşkêş dike. saet:18:00

ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



● 20 adar 1998 tî:

Ji beşa sînemayê ya NÇM'ê bi navê "AVINAR" filmek ku li ser Qetîama Helebçeyê radiweste, tê nimandin. Derhênerê filmê Shahram Asadî ye. saet:18:00

Li MEDKOM'ê

● 14 adar 1998, şemf:

Gotübêj: 'Ji Kevneşöpiya devkî, ber bi çanda nivîskî ya edebiyata kurdî Muhsin Kızılkaya, saet:17:00

Komeke nûhatî-Koma Şengal: Li dûrî Welat



Koma Şengal, ji şaxa NÇM'ê ya Îzmirê ye. Ev salek e ku, di nav NÇM'ya Îzmîrî de xebatê xwe yên li ser muzikê didomîne. Koma Şengal, roja 8'ê adarê, li şaxa NÇM'ê ya Stenbolê konserlik li dar xist. Komê, di konsera xwe de nêzîkî 15-16 stran pêşkêş kîrin. Di konserê de, bikaranîna kemanê jî konser balkêşir kir. Ev yek li konserên li NÇM'ê kêm caran tê dîtin. Endamên komê, di warê lêxistina amûrên muzikê de, ne kêmî xwe bûn. Endama komê Hatice, li ser gitar, Berîvan li ser orgê, Tîrkan jî li gitarê hûr dibe. Endamê çaremin Sâdik jî, bi lêdana tenbûrê mijûl e. Hemû endamên komê ciwan in.

Koma Şengal, di warê muzika aqademîk de hê nûhatî xuya dike. Jîxwe endamê komê jî vê yekê dipejîrînin. Lîcudatiyek di vê komê de xwe dide der. Ew jî dengê xwezayî ne. Dengê endamekê li stranê nûjen, yê ya din li stranê gelerî tê, dengê din jî şewazeke xwezayî ya Kurdistanî di nav xwe de dihewînin. Di nav wan yekan de, dengê kemanê jî wê xwezayîbûna dengê endamên komê têkûzîr dike. Ev cara sêyem e ku, kom derdiyeve ser sahneyê. Li gel nûbûna wan jî, kîfxweşîya besdaran ji lêxistina çepikan diyar dibû. Li ser vê yekê me, weki her car kurtehevpeyvînek bi endamên komê re pêk anî.

Tîrkan Akay: Ew, dema li paş perdeyê ye û dema perde vedibe, dikeve nav hestê zor xerib û biyanî. Ew dibêjê: "Li şaxa me perdeya sahneyê tune ye. Em hînî perdeyê nebûne. Lewre, dema perde vedibe, ez xwe hînekî xerib dibî-

nim. Ez dema stranê ku hatine bestekirin distrêm, dilfireh im, lê dema em kemanê di nav stranê xwe de bi kar tînin, em dibêjin 'gelo wê gel çawa binixîne?'''

Hatice Yaşar: Ew xwe li vê derê li ser sahneyeke ku, hînî nebûne, biyanî dibîne. Ew dibêjê: "Ji ber ku, em zêde hînî sahneyê nebûne û ew yek nahêle ku, em performansa xwe nîşan bidin. Dema ez li ser sahneyê hestiyar dibim, baştır distrêm. Wekî şewaz (tarz) jî ji ber ku gelê kurd ne azad e şewazeke têrgîhişî jî niha ne gengaz e."

Berîvan Yetim: Ew, ji ber ku li ser teknîka nûne şareza ye, bi heyecanê dikeve. Ew jî hestê xwe wiha tîne zimên: "Ji ber ku teknîk li min xerib tê, ez bi heyecanê dikevîm. Digel vê yekê, nûbûna amûrên muzikê jî heyecana min zêdetir dike. Ez ji ber ku, bi kurdî baş nizanim, car caran dikevîm tengasî ye. Her wiha ev yek nahêle ku, ez hestê xwe yên li ser muzikê başbaş derbibim."


Sadik Doğan: Ew jî, ji ber ku nikare kurdî baş bixebitîne, dikeve nava heyecanekê: "Dengê me nekemîlî ye, em hîna amator in. Lewre hîdî em dê vê yekê ji ser xwe biavêjîn."

Armanca komê ew e ku, bi motifên otantik muzika gel a hemdem biafirîne. Kom, niha bi xwe stranan danarêje. Sedema vê yekê jî girêdayî, dûrbûna ji Kurdistanê tê dîtin. Li gorî endamên komê, dema mirov li ser welatekî strana çêbîke, divê di nav wî welatî de bijî an jî hin tiştan bibîne.

SERWİSA ÇANDÊ/ STENBOL

TîSK

asma adare xora
ze adir a



KAZIM TEMURLENK

A sma adare raşîjî jî zê adirî ya. Namê xo adir ra yeno. Zimistan ke qediya, tijî herd û asmen kena germ, adir kuno vore (sokun kuno vore), vîleşîna ro. Vore hînî sona, ekê sero adir wekerê hînî ne vîleşîna ro. Dîrê roj de ray olaxî benê şâ. Dorme rawo, der û dor, ebe çiçegi vore beno pir. Îndî zimistano kal û kokim hîdî hîdî teşîrê xo keno vinî, sipî zê xeyalê verê çiman darîno we. Binê vore ra herd zê domanê dixaskane yeno riye dîna. Dar û ber sero çirqayısê koçenî mîjdana talaborikî dano. Vamî, hericî çiçegi kene ya. Meşî çiçegi be çiçegi fetelîne, xingarina zimistani xo sero erzene. Usar ke ama riye militî hûno. Elo qom hawtê mardtê de, jaru daru ziyaret keno, çilo fino ra ci, miyaz keno vila, qurbanô sere birnenê. Ebê hawtê martê asma adarê re xêr ama vanê. Kêvanî axwa serdinê xo sero erzenê ke qatixê sera newiye rind çikuyo. Tayê jî axwa serdine kene xoro ke neweşîye mezere. Asma adarê de hurinda newrozî zaf muhîm a. 21 adarê de sere bona newî. Adir bene we milet ser ra çindano, dilece xo pecene ke, a sere çike wazena va bero hurindî. 21 adarê de kawu kelebût beno, cinî û camêrd kinconê xo yo rindeko cene pira. Îndî giran giran hegâyî helbenê, toxim erjîno.

Usarî ebe asma adarê dest keno pira. Şâîrî, nustoxî rindeko usarî sero şîironê rindeko, nustinê rindeko nusnenê. Verî ra nat sanikî, kuratey, tewr jêde usarî sero qesey biye. Rindekîna Usar de teşîrê zimistani zaf o. Zimistan mi gore zaf rindek o. Hama beniyade ke, milet tewr zêde zimistan kuno tengê. Vore vorena, mal gay kunê zere. Ray aloxî bene qapan. Hergu ci hazırlîya zimistan sero beno berz. Xora ke hazırlîya zemistani rînda, tedarikî zimistan de kemiye ke çîna, a sere rind verena ra. Hama eke tene kemiye bi, hergu ke, ebe layî usarî oncen. Eke hînî bî, hem usar sero xêlê çî qesey beno, hem jî qedr û qiyetî usarî beno zêde. Çî ke usar ke ama vejîne retiye, serd nêmaneno. Ray olaxî bene ya.

Asma adare de dîna enara xo, bona xorte. Çitûrke domanî yenê dîna, hata vîst sere benê pîl, usare jî hînî say beno. Asma adare dest piro kerdîna cengî ya jî. Miletî bindest zimistan hazırlîya cengî vîneno. Usar ke ama dest keno cengî reyayin. Verva na koledarî jî na asme de vejîne neçirê miletanê feqîro bêzaro.

Miletanê Rojhîlatê Miyanî adarê sero xêlê çî vajîyê û nuşiyê. Çitûr ke adare dîroka ma de Kawa wo asinkar veto werte, yi qomonê bînan de jî xêlê meseleyê qehrenamiye vetê werte.

Dîroka made 21 adarê hem sera newî ya, hem çî dugela Medi 21 adarê de saniya pê. 'A roze ra nat Kirmancî newroz pîroz kenê. Ham dugelane koledaro boyna roz şenone kirmancan rî bimanê. 1982 de Mazlun Doğxanî ebe canê xo adirê newrozî kerd berz. 1982 ra nat asma adarê dayina zêde biya germ. Îsone ma hergu asma adarê de, reyayin ra tenena beno nêzdî.

NEWROZ PİROZ BE.



AMADEKAR: RAMAN ÇAKAR ROŞAN LEZGİN

Tıştonek

Çivanok

Kaçûmace (Ka çû ma ceh)

Kurtûrdît (Kur tûr dît)

Dumîzan (Du mî zan)

Sê caran li ser hev bibêjin:
Hermê gêr bû, min hermê
gez kir. Gû gêr bû min her-
mê gez kir.

Hîrê ray pêsero vacê: Sêz
wena mîz nêwena, mîz nê-
wena sêz wena.

Ses ray pêsero vacê: Sêse-
me ra sêseme vîst û şes sê-
semey

Hîrê ray pêsero vacê: Lore
rûn lole ser ra liş

*Bin hera de, miyan herî de, sere Ew ci ye?
merdimî de

(xele-genim)

Tıştek heye

(çav)

*Bize şina xo dima nexşan kena

(pişkile)

Pir piçük e

Xemla dinyayê

*Çikêm esto, to wa besto

(name)

Giş li bin lingê wî de

Derbas dibe

*Çiwa çewt e, pey hewt koyan de
kewte

(raye)

Ew ciye?

(Derzi)

*Destê xo kena peynî, fek beno a

(meqes)

Tıştek heye

Dinya giş serê wî

de ye, ew jî

Cêba te de ye

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Ew ciye?

Xebateke Înstrumental:



ÇIROKA ŞEVÊ

Xebatê bo nûjenkirina muzîka kurdî, di salê dawîn de lez girt. Huner-mendênu ku, dixwazin motifên muzîka rojavayî li muzîka kurdî bînin, ketin nav tevgerê. Ev hewl, ji aliye hin kesan ve wekî hewleke ku muzîka kurdî xera dike, hate binavkirin. Hin kes ji, li xebatê bi vî rengî sor bûne û motifên rojavayî di muzîka xwe de bi cih

yî ye. Kaset, di warê bikaranîna vokalan de serketî ye. Bi taybetî, di stranê "Lo Dilo", "Berbang", "Jana gel", de vokal baş hatine bikaranîn. Dengê vokalan carina newaya aryayan tîne bîra mirov. Li aliye din qlarnet, di kasetê de, zêde baş li newayê nehatiye anîn. Lé, keman di kasetê de baş hatiye bikaranîn û xwe dide pêş.

Di kasetê de balkê e, baxlama

dikin. Ji van kesan yek ji, Koçer e. Wekî tê zanîn Koçer, bi navê "Warê me", "Min ci dî" du kaset derxistibûn. Koçer, bi navê "Çiroka Şevê" kasete ke nû, ku însturmental e, derxist.

Di "Çiroka Şevê" de, motifên muzîka rojavayî bêhtir xwe didin der. Ji newayê (melodi) pê ve, şewaza vokalan ji di gelek newayan de rojavayî ye. Kaset, di warê bikaranîna vokalan de serketî ye. Bi taybetî, di stranê "Lo Dilo", "Berbang", "Jana gel", de vokal baş hatine bikaranîn. Dengê vokalan carina newaya aryayan tîne bîra mirov. Li aliye din qlarnet, di kasetê de, zêde baş li newayê nehatiye anîn. Lé, keman di kasetê de baş hatiye bikaranîn û xwe dide pêş.

Berga kasetê ji aliye dîtbarî ve baş hatiye sazkirin û bi spehîbuna xwe balê dikşîne. "Çiroka Şevê" ji aliye Koçer Production ve hatiye tomarkirin û amûrên wekî, gitarê klasîk, bass û elektro, keman, kanûn, mey, qlarnet, tenbûra elektro, bendir, darbûke, perkisyon- klavye hatine bikaranîn. Vokalê kasetê ji Kazo, Figen Genç, û Koçer e.

SERWÎSA ÇANDÊ


jin, li benda bihara me ya herî xweş in." Di dema Şerê Duyemîn Lihevparkinê yê Împerialistanê û de, hêzên faşîst ên İtalyanî ji bo ku Hebeşistanê dagir û bombebaran bikin amade ne. Lé zivistan rî nade vê yekê. Lewma ji ew li benda bihara Hebeşistanê ne. Ji bo ku ew bihareke pak û delal bizivîrinin dojehhekê wan pêdîvî bi adarê heye. Hema bêje, di hemû ol û felsefeyan de, jin û bihar remza bereketê ne. Çavkaniya jiyanê û domandina xwezayê bi saya jin û biharê pêk tê. Dibe ku, ji ber vê be, tevahiya jinê cihanê yê kedkar 8'ê adarê ji xwe re wekî roja têkoşînê pejirandine.

Jina kurd, xweşikahî û bedewtiya xwe ya ku ji têkoşînê girtiye, tevî xweşikayiya bihara welatê xwe kiriye. Heke rojekê dîroka jinê cihanê ji nû ve were nivîsin, gelek rûpel dê ji bo jina kurd werin vegetandin. Li nik navê Roza Luxemburg, Clara Zetkin, Leyla Xalid, Rozenberg, Nataşa û yên din, navê Rewşenan, Bêrivanian, Bêrstan, Zilan, Gurbet û Azîmeyan dê cihekî girîng bigire. Jî bilî van navan, bi hezaran jinê kurd ên ku navê wan nayê nasîn, li welatê me, ji bo ku bibeine xwediyê bihara xwe, gelek berdêlîn ku mirovan matmayî dihêlin, didin. Senaryoya her yek ji van berdêlan, mijara filmekî bijarte ye. Bi taybetî, jina ku bi sei de ji dayîk be, hêj dijwartir dibe xwediyê berdêlîn giran. Dayikek hebû.

Navê wê ji Dayê bû. Navê wê yê rastî ew bû. Diya sê zarakan. Du law û keçek. Lawek şehîd, û din ji şervan bû. Ew û zilamê wê her du ji misext bûn. Bi nasnameyeke din dijîyan. Gelek eş û kul, bi wan re çebûbûn. Zor û zehmetî, işkence û

Nûbihar derket

Hejmara 59'an a kovara Nûbiharê derket. Di pêseka kovarê de hatiye gotin ku bi 60'i re, wê kovar penc salan li pey xwe bihêle, bikeve nava sala 6'an. Tê daxuyandin ku wê bi wê hejmarê re li ser hinek mijaran dosya bêñ amadekirin, navê dosyaya meha avrêlê ji hatiye diyarkirin. Dê dosya li ser rojnamegeriya kurdî be, ji ber ku bi meha avrêlê rojnamegeriya kurdî sedsalekê li pey xwe dihêle.



Nivîsa sereke ya vê hejmarê ji aliye Süleyman Çevik ve hatiye amadekirin. Sernavê vê nivîsê "Du dijminen vê rejîmê: Islam û Kurd" e. Di vê nivîsê li ser helwesta rejîmê ya nîjadperest û dijminatiya ku wê li hemberî bawermeden dinê islamê û gelê kurd daye mesandin, tê rawestandin. "Dubeyti" yê Baba Tahirê Uryan ku ji hêla

Sabah Kara ve ji lorî tê wergerandin, di vê hejmarê ji cih girtine. Nivîsa Prof. Dr. Emîn Alî Saïd a bi navê "Nêrînek li ser kurdî: Doh û iroya wî" ku ji hêla Abdurrahman Adak ji erebî hatiye wergerandin, bi naveroka xwe balkê e. Di vê hejmarê de hinek nivîs û helbesten ku derketine û nivîskarêwan wiha ne:

Darênen welat neşewitînin (R. Karakaya), Dalpey (Koyo Berz), Bihara Kin (Ray Bradbury, ji norwecî werger Hilmî Yeşiltas), Ci dibe hûn ji xwe nas bikin (Xweşbêj), Sîrata musteqîm (Aqîl Muhacir), Reşbîniya biyanetiye (Sîdîq Gorîvan), Seyrana Mem û Zinê (Ş. Doğan-A. Doğan) û Sêzdeh û nîv (Felat Dilges).

SERWÎSA ÇANDÊ

Adar, bihar û jîn

HASAN KAYA



Jî ber ku ez ê qala "adarê" bikim, zêde bi xwe ne bawer im ku ezê bikaribim nivîsarake hêjâyî wê binivîsim. Her wekî adar, bihar e. Bihar ji mazûvanê gelek bûyerên giranbiha ye. Gelek mîvanê delal, singê konê xwe di sînga xaka adarê de, li ser welatê me yê xemgîn kutane. Ne bi tenê li welatê me, li gelek deverên cihanê mirovîn herî xweşik di vê mehê de, bûne rîwingê bêveger. Ji ber vê yekê ez dikarim bibêjim, bûka demsalan ango "adar" navek ji yê pakrewanan e. Di vê mehê de, kîn û nefreta dilê neyarê dilpâkî û mirovahîyê pîrtir dibe. Hezîrin û evîna dilê dilketiyê azadî û xweşikahî yî gûrîr dibe.

Ev felsefeya jorîn, hem ji bo gelan û hem ji bo zilimkaran bûye wekî kevneşopekê û didome. Ji ber wê yekê cejn û rojîn girîng ên gelan di vê mehê de ne. Gel dixwazin gaveke din ber bi rojîn xweşîya ku heye ji wergerîn dojehê. Şairekî tîrk, wiha bang li lehengekî Hebeşî kiribû: "Taranta Babû ! ji bo ku me bikujin, li benda bihara me ne, ji bo ku me di welatê me de biku-

tade ji destêne dagirkiran dîtibûn. Bi ser de ji, gelek bêlayê nexweşîyê li wan peyda bûbûn. Tevî evqas qewimînan, dayika Dayê mîna keçêke çardeh salî, bi coş kar û xebat dikir. Her çiqas hin caran avahiyê metrepolan ên betonî, xirecira erebeyan, ava bêhn genî, hewaya bi qirêj û hwd. li ser psîkolojiya wê tesîr dikir ji, min nedît ku wê bi qasî serê derziyê, hêviya xwe ji welatekî têr bihar birî. Paşê, ji mecbûrî Dayê ji metrepolen Tirkîyeyê berê xwe da metropolen Ewrupayê.

Nizanim çîma, dema ku qala 8'ê Adarê hate kirin, dayika Dayê hate bîra min. Gelek tiştîn din ji têne bîra min. Niha li serê çiyayê pozbilind, pêçiyêne keçen ciwan bi azadiyê şâ dibin. Niha xaka me ya şîndar, rûyê gelek xezalîn artêşâ dil-pakîyê radimûse. Heşte adarê, li gundekî geleki dûr, a niha qêrîna bûk û zarokên ku li ber potû û singoyan e. Heşte adarê kûlîlkek e, li ser sînga gora jinê pakrewan. Li ser sînga gorê winda, li ser sînga gora jina ku nayê nasîn e.

Heviya min ji pêñusa min ew bû ku, dema qala biharê, adarê xak û jina kurd hate kirin, diviyabû peyv ji qalikê xwe yê zêrîn derbixista. Peyv biketana govenda tarîfe. Li pey hev rîz bibûna, mîna ristikê morikê mircanî. Ku peyv zêrîn nebin, çiqas min dil hebe ji, ez dê çendî bikaribim bidim zañîn. Lewra çav dibîne, guh dibîhîze, lê dil rî nadê, ji bo ku ez dilîniyê xwe yên der barê jin, bihar û adarê de bibejim. Ji ber ku çîrok pir in. Erjeng in û yek rî nadê ya din. Lî ez dikarim bibejim ku, her bihar, jina kurd a xwedî bawerî, haveynê jiyanekî azad dimeyîne û ji neyarê biharê re dibêje: Tifîfî.....

Gerîla Efendî



Rojekê di navbera gerîla û leşkeran de şer rû dide, di encama şer de gerîla çar leşkeran dil digirin û tînin kampê. Zanava (kunye) wan ji wan dipirsin; yek dibêje ez ji Enqereyê me, yek ji dibêje ez ji Îzmîre me, yê din jî dibêje: "Dîmîme îmanîme nenem Urfalîdir! (Bi dîn û îman dapîra min ji Rihayê ye.)" Gerîla dibêjin: "Vî xayînê mezîn bidin aliyeke." Yek ji wan jî efser (subay) e. Ew jî dibêje:

— Welehi Gerîla Efendi! Dedem hep nemaz kıldıgında, fatihadan önce Bijî Serok Apo diyor. (Welehi Gerîla Beg gava bapîrê min ku nimêj dikir, beriya Fatiheyê pêşî digot 'Bijî Serok Apo'.)

Eyşê

Rojekê gerîla riya minibusa cerdevanan (korucu) dibirin. Wan didin hev, navê wan dipirsin. Navê tespîtdikin û wan didin aliyeke. Di nav wan de jinikekê jî heye û navê wê dipirsin. Jinik dibêje: "Navê min Eyşê ye." Navê dayika qotûmanê gerîlayan jî Eyşê ye. Dayika wî bi bîra wî dikive û bi keser dibêje: "Ax ax Eyşê tu were vî alî yî!" Pişti vê gerîla navê serokcaş jê dipirsin. Serokcaş dibêje: "Navê min Elî ye, lê gundî giş ji min re dibêjin Eyşê!"

RAMAN ÇAKAR

Temenê Mûmyayê

Li Misirê mûmyayek tê dîtin. Ji bo ku temenê wî bê tespîtkirin, ji çar aliye cihanê zanyar û şereza ji aliye hikûmetê Misirê ve tên vexwendin. Komek zanyar jî, ji Tirkîyeyê dice. Peşî zanyarên Emeriqî diçin menzelê, li mûmyayê dînihîrin û dû re der dikevin û dibêjin: "Bi baweriya me, temenê wî di navbera 2000-2700'an de ye." Peyre yên rusî dikevine hundir. Ew jî bistekê lê mêze dikin û dibêjin: "Li gorî me jî, temenê wî di navbera 2000-3000'an de ye." Welhasil zanyar bi dorê ve dikevine hundir û der barê temenê mûmyayê de dîtinê xwe pêşkes dikin. Herî kêm di navbera texmînên wan de, 500 sal heye. Kesej ji sedî sed der barê temenê mûmyayê de nikare tiştekî bibêje. Pişti van kesa koma zanyarên tirk dikeve mezelê. Bi qasî 2-3 saet di hindur de dimînin. Piştre koma zanyarên tirk ku derdikevin. Pisporêñ din li mezê dikin, ku zanyarêن tirk di nav xwîdanê de mane. Ji wan dipirsin: "Ka hûn der barê temenê wî de ci difirin?" Yek ji zanyarên tirk bi awayekî bixwebawer bersiv dide: "Temenê mûmyayê 2367 û 8 mehî ye." Zanyarêñ din şaş û metel dimînin û dipirsin? "Gelo hûn çawa ewqas bixwebawer in". Zanyarê tirk hinek difikre û bersiv dide: "Ê wele hinekî em pê da ketin, lê di dawiyê de me ew da xeberdan."

Zenke

Mirovekî gundi, rojekê di nav mîrga xwe de giya dicîne. Lî mêze dike, ku etarek ber bi gundiwan ve dice. Bang li etar (çerci) dike û dibêje: "Ez bawer im, barê te şilor (erûg) e. Etar dibêje: "Zen ke." Gundî dîsa dibêje: "Ez bawer im, tu yê herî gundi me." Etar bersiv dide: "Zen ke" Gundî cardin jê dipirse: "Ez bawer im, tu yê herî li ber deriyê mala me şîlorê xwe bifroşî."


Etar wiha bersiv dide: "Tu wê jî zen ke." Di dawiyê de gundi tê ser meseleyê û dibêje: "Ez bawer im, tu yê şîlorên perçiqandî û merçiqandî berhev biki! Bide mala me." Etar di cih de bersiv dide: "Tu wê qet zen neke!"

RÊNAS LALEŞ

BI XELAT...

XACEPIRSA BI XELAT (111)

XACEPIRSA



Bersiva Xacepirsa 109'an



Xacepirsa me bi xelat e.

Di 15 rojan de ci bersiv bigîhîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin.

Xelata hejmara me ya 111'an Kasetta Koçer 'Çiroka Şevê' ye.

Jeronot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarı" di nava qutiyêni li bin xacepirse de binivisîn û teví navîşana xwe ji me re bişinîn.

Penc kesen ku xelata hejmara 109'an pirtûka Ali Yılmaz 'Toprak Vatan Kokuyordu' qezenc kirine: Ferit Şahin/Êlih, Evîn Rênas/Stenbol, Mistefa Aram/Bilis, Rûsen Yekta/Semsûr, Arjin Çelik/Stenbol

Gorepan Şehîdeki taxa gazi (wêne)	Taxeke serhildér Şewitîn	Cadır Têbîni	Bajar Dawera karbonê	Dendêra 'ap' Mirov, însan	5	Resmi
1					Dawera florê Daçekek	
Dîtin				Ast, seviye Ezman		
Tipek dengdar	Geliştek Derxist		Dawera argonê Banda radoyoyê	Listîkek Kurdistanî Xeyîdin		
Bi kirdki 'du'		Subay Sewalek	7		Tipek Dawera potasyomê	
Bi kirdki 'meh'	2		Nimûneyî Peşgirek			
Tipek	Agîr Daçekek		Bî devoki 'min' Bajareki Kurdistanî			
Kincek			A wer, normal Dawera Kriptone			
Bal, cem Ji bo bükê birayê zavê	3		Pâşgirek Dawera oksijenê			
			Netir	Dawera azotê		
				1 2 3 4 5 6 7		

PEYVA VEŞARI



JİSOT

LEŞKERËN TIRK ZAROKËN
KURDAN PERWERDE DIKIN..RAST
BINVISE
LAW
KURË
ERMEÑIYANAPO BI XWE ERMEÑI YE
ONNO TUNG ERMEÑI YE
ARA GÜLER ERMEÑI YE
ARSHIL GORKY ERMEÑI YE
PETROSYAN BI XWE ERMEÑI YOGELÖ EZ
Jİ NE
ERMEÑI
BIM?

samet.

Xo kena, zewbiyan jî rexne kena

Dewleta tirk mesela
Kosova de jî diriyinkenê. Roj
û seata ke dewleta tirk
bombey varnay ceniyanê
kurdan ser, hezarana
ceniyanê Kosova qandê 8'ê
adar, "Sûka Pirîşfîna" de
amey pêser, hem terteleyê
sirpan protesto kerd û hem jî
Rojê Ceniyanê Kedkaranê
Cihanî pîroz kerd, sirpan
teva nêkerd.

Ceniyanê kurdan û dostanê ci qandê
"Rojê Ceniyanê Kedkarenê Cihanî"
pîrozkerdin verdê jew heftî nameyê
panj cayan, dawo dewleta tirk û wast ke nê
cayan ra jeverî de 8'ê Adar pîroz bikrê. La
belê dewleta tirk, nê panj cayan ra qe jew ca
jî, nêda ceniyan. Ca nêdayin ser, ceniyanê
kurdan û dostanê ci jî, wast ke rojê ceniyan
Warê (meydanê) Taksimî de eşkerakerdina
pîroz kirê.

Coka 8'ê menga (aşma) adar de, roj
yewşeme, qandê ca nêdayinê dewleta tirk
protestokerdin û 8'ê adar jî jew eşkerakerdina
pîrozkerdin, Warê Taksimî de nêzdiyê 6
hezar ceni arêbiyay pêser. Nînan miyan de
heveyê ceni bî, qeçekê xo yê hewt-heşt men-
gey û jew-di serey, xo de ardibî û wastibi ke
rojê xo, qeçikanê xo ya piya pîroz kirê. Co-
ka çinayê xo yo rind û newe dabî xo ra, qe-
çekê xo, way û birayê xo û heveyan jî tornê
xo girotibî xo vereki û ameybî Taksim ke
rojê xo pîroz kirê. La belê polisan dewleta
tirk bombey varnay ceniyan û qeçekan ser û
nêvirada ceniyan kurdan qandê rojê xo pîroz-
kerdin jew eşkera kerdin virazê. Polisanê
dewleta tirk, verî rojnamegerî girotî binçim
û peyra jî wast ceniyan vila kirê. Ceniyan jî
yat: "Viradê eşkera kerdinê xo bikim peyra



ma dê vila bim." La belê polisan wastenê ce-
niyan qabûl nêkard û jû fin ra qeçekî meçe-
kî nêvât û bombey varnay şêligi ser. Çend
deqan miyan de, Warê Taksimî açarniya wa-
rê şerî (cengî). Polisan boñbayanê isotana û
jopana şêligi rê vardayin virast, şêligi jî qan-
dê xo pawitin sî û kerey çekardî polisan.
Vardayinan nezdiyê jû seat ramit. Vardayi-
nan peyra heveyê polisi, heveyê ceni û heve-
yê jî xorfi bî dirbetinî û heveyê qeçekan ma
û piyê xo kerdî vinî û çend seatî bêwayıir
mendî. Vardayinan peyra nezdiyê hîris kesî
girotiyay binçim. Muhabîr Rojnameyê Ülk-
kede Gündemi Faruk Aktaş û Bülent Acar jî
nînan miyande bî.

No mabend de xeylê camê dukana û
bankayan şikiyay. Dewlet û medyawa ci vat:
"Endamanê HADEP û endamanê partîyanê
beqanûnan camê dukana û bankayan şikî-
tî." Yanê bombeyê isotinî varnaynenê şêligi
ser, jopana zey kutikanê haran resena qeç-
ikan û ceniyan û fatura wa ci jî wazenê HA-
DEP rî bibirnê û riye xo yê rastîn racenê.

Diriyinê dewleta tirk

Peyra jî werzenê terteleyê ke hetê "sirpa-
na" Kosova de viraziyenê ïnan anê ziwan û
sirpan rî xeber rîşenê û vanê ke, ma yê wa-

zem şima mesela xo raya pêrodayin û lejker-
dina nê, raya demokrasî û siyasiya çareser
kirê.

Ma yê jî wazem hemû meselê siyasî, raya
demokrasî û siyasiya çareser bê. La belê
dewleta tirk û Medyawa xo ya piya, zey me-
selanê bînan, mesela sirp û Kosova de jî di-
riyin (durûti) kenê û hendê sirpan jî nêbenê.
Roj û seata ke dewleta tirk bombey varnay
ceniyan kurdan ser, eyî roj û eyî seat de,
hezarana ceniyanê Kosova qandê 8'ê adar,
"Sûka Pirîşfîna" de amey pêser, hem terteley-
ê sirpan protesto kerd û hem jî Rojê Ceni-
yanê Kedkaranê Cihanî pîroz kerd. Serman-
yan û serdaranê dewleta sirpan teva nêkerd.
Ceniyanê Kosova zey zanayina xo, wasten û
vînayinê xo ardi ziwan, sirpan vengê xo nê-
vet:

La belê dewleta tirk bombey varnay ceni-
yan kurdan ser. Ewro jî vejîyenê Evrûpa ra
vanê verê sirpan bigirê. Ma yê winî bawer
kemi ke, ne şarê kurd û ne jî şarê dînyayo
tertelanê dewleta tirk xo vîra mekîro. Jew
tertelanê dewleta tirk jî, nê dewletê ke zey
dewleta tirk şaranê bindestan rî terteley,
zîlm û işkencîy virazenê, iyê barbarîna nê
dewletan jî xo vîra mekîre.

MEMED DREWŞ

Atodya
WELATRojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Gündem Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
SELAHATTİN DELİ
Yönetim Yeri
Çakırğa Mah. Sorguçcu
Sk. No: 11/6
Tel: (0212) 530 01 40

BÜROYA İRTİBATÊ
(İRTİBAT BÜROSU)
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALÎH TAŞKESEN

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYEN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nûnerê Giştî yê
Ewrûpâye)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15
Brûksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03
Suriye:
Jana Seyda
Helîm Yûsiv
Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 17 40
Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

ULKEDÊ

Ji Gündemê

Ji Editore Ü, Gündemê

Jin, di 8'ê adarê röja jinê kedkar de wekî berê dîsa li qad û kolanan bûn. Jin li Stenbol, İzmîr, Amed, Edene, Mîrsin, Antalya Wanî, bi kurtasi li bajarê kurdan û li seranseri Tirkiyeyê bi coş, şahî û hêviya azadbûnê, bi têgihiştina wê rastiyê ku têkoşîna li dijî çewsandina çinî-neteweyî-cinsî bitenê bi rêkxistibûnê tê dayin; bi serwextbûna vê yekê ku serfiraziya cîvakê, bes bi serfiraziya jinê mimkûn e, qırıyan û ev hest û raman bi serbilindi derxistin qadan, jîyîyan û dan jîyandin. Jinan li Taksim û Amedê bi qırînên xwe anîn ziman ku ev roja gerdûni li Tirkiyeyê rastyeke din diyar dike. Jinê 8'ê adarê di riya azadiyê de, jinê kezebşewitî, ên zarokên wan di şer de, di kuştinê kiryar nediyaran de bi kurtasi di şerê qirêj de hatine kuştin û windakirin; jinê ku bûne lêqewimiyen (mexdûr) van kîrinan, daxwazê xwe yên teşhîkirina şerê qirêj û aştiyê bîlind kîrin.

Roja jinê Kedkar ên Cihanê 8'ê adarê. Qada Taksimê bû qada şer. Polisên ku êrisi jinê ku ji bo mafxwestine derketibûn qadan kîrin, tenê bi vê kîrinê neman, êrisi rojnamevanen ku ji bo karên xwe hatibûn jî kîrin û ew xîstin binçav. Ligel vê kîrina polisan medya ji destvala nesekinî. Rojnamevanen ku ji aliye polisan ve lêxistin xwarin û ketin binçav, derbeya duyemîn ji ji medyayê xwar. Di rojnameya Hürriyetê de bûyera navborî bi şernavê "Provokator Taksim'e çıktı (provokator derket Taksim)" hate dayin. Di nûçeyê de der heqê rojnameya me Ülkede Gündem de idayen bêbinî û derewin hatin dayin. Di vê nûçeyê de nûçegihanen me wekî "xwepêşanderen ku pankartên li derveyî zagonan dadiliqinî" hate nîsandayin. Lî di nûçeyeke din de nîsin ku nûçegihanen me Faruk Aktas û Bülent Acar wekî rojnameger hatine binçavkirin, wekî "di bûyeran de rojnamegerine ku di nav wan de nûçegihanen Ülkede Gündem Faruk Aktas û Bülent Acar ji hebûn, hatin binçavkirin." bi awayekî vekiri dane.

Pistî ku me ev nûçeya Hürriyetê xwend, hemû lêpîrsinîn me ku jêderka van nûçeyan ci ye, ki ye an ji bo ci tiştekî bi vi rengi nîvisine? bêencam man. Şefî istixbaratê Celal Korkut di hevdîtinê me de got ku binwene ji aliye wan ve nehatiye nîvisin, lê kesen karên nîvisaran karin ji me re bîbin aîkar. Bi kurtasi hevdîtinê me yên bi hemû kesen rayedar ên Hürriyetê re bê encam man û bi awayekî vekiri tiştek bi rengê xeletiyek cêbûye, em dikin ku serast bikin" ji me re negotin. Ev yek ji aliye etika rojnamegeriyê ve infazî e.

Jixwe rojnameyen ku li ser heman xetê de dimesin ji, êrisa polisan a li ser zarok û dayikan mafdar derxistin, û bi vi awayekî ci dan mitinge, rastî berevajî kîrin, an cavêx xwe ji rasuya re girtin.

8 adar 1998 yekşem:

8'Ê ADARÊ PİROZ BE

Calakiyên bi mebesta 8'ê adarê roja jinê kedkar ên cihanê, duh jî berdewam kir. Jinan di çalakî û şahîyên li Stenbol, Enqere, İzmîr, Mîrsin, Edene, Amed û Elîhê de xwest ku ji bo azadiya jinan, hemû jin werin cem hev û bi rêxistin bîbin.

Li Stenbolê jinê ku bi banga "Însiyatîfa Jinan a li Dijî Ser" duh civiyan, pankarta "Em şer naxwazin" vekir û meşîyan. Platforma jinan a Enqereyê ku daxwaza wan a hevdîtina girtiyen jin ên Girtigeha Sergirtî ya Enqereyê nehate pejirandin jî, ev kirin şermecâz kir û çîçek danin ber girtigehê. Li gel van, dîsa platforma ku rê nedan wan ku li kolanan çalakiyên xwe pêk bînin, bi girseyî beşdarî çalakiya rûniştinê ya İHD'ye bûn.

9 adar 1998 duşem:

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:

WERIN EM BI TİFAQÎ BIKEVIN NEWROZÊ

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan, xebatên yekşîtyê nîrxandin û xwest ku kurd Newrozê di nava tîfaqê de pîroz bikin. Öcalan bal kîşand ser rewşa iroyin a kurdan û da zanîn ku kurd ji şerê navxweyi zerarê dibînin, pêwîst e ku bawerî û wîjdan vê yekê qebûl neke. Öcalan wiha berdewam kir: "Xebata ji bo dijmin bes e, perçebûyin bes e, êdi hev û din lawazkirin bes e."

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan di programke MED TV'ye de bangâdarî kî

Öcalan bal kîşand ser vê yekê ku aşti ne bi gotinan, bi bernameyên ku mirov li ser li hev bike, pêk tê û wiha berdewam kir: "Berî her tişti pêwîst e ku tîfaqekê kurdan ku fikir û hes-tîwan bigihîjîne hev, pêk were." Öcalan li ser daxwazên wekî 'divê PKK ji Başûr derkeve ji sekîn û got ku, ew jî vê yekê pir dixwaze lê, divê pêsi tîfaqa siyasi pêk were û divê her kes alîkariyê bide şoreşa li Bakur.

Serokê Belediye Amedê yê berê Mehdi Zana ku ji bo yekîtiya neteweyî û têkiliyên kurdan çûye başûrê Kurdistanê, li ser aştiyê çavdêriyên xwe yêrîn erenî diyarkirin û got ku "eger ku ev yek pêk bê, emê îsal wateyeke giranbiha li Newrozê bar bikin."

Davûd Baqustanî ku bi partiyen cur bi cur re hevdîtin pêk anîne, got ku aşti ji her demê nêzikir e.

10 adar 1998, sêşem:

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan:

WERIN EM PÊŞEROJA XWE BI HEV RE SAZ BIKIN

Serokê Giştî yê PKK'ê

Abdullah Öcalan ji bo siyasetvan û leşkeran banga bi hev re sazkirina pêşeroja

Tirkiyeyê kir û got "divê demokrasi û zagonan bikar bînin. Bila ji PKK'ê netirsin, hewce nake ku pişta xwe bi hêz, rîliber-girtinê derveyî girêdin. Ez dibêjim em bi hev re hundirê Tirkiyeyê saz bikin. Öcalan diyar kir ku, artêşa tîrk ji 1995'an ve li dijî PKK'ê planê bi rengê 'li serê çiyan tenezar bûye, ji bêyî teslimbûnê tu riyan wê nemane' stratejiya xwe ya marjînalkirinê bikar tîne. Abdullah Öcalan ifade kir ku vê konseptê iflas kîriye, artêş di nav xwe de ev nîrxandin kîriye.

Öcalan bal kîşand ser qerara



Rêlibergirtin û zordariyên le ser Ülkede Gündemê didomin

Dumayê ku Tirkîye divê bi PKK'ê re li ser maseyê rûmê û tewra Elmanîa tî got ku ABD jî di rawestîna perspektiveke nû de ye. Öcalan bi vê sedemê diyar kir qewimînê di nav artêşê de jî pêk bîn girîng in û dikarin bi PKK'ê re têkevin diyalogê

11 adar 1998 çarçem:

PERWERDEHÎ JÎ DI BIN EMRE ŞERÊ TAYBET DE YE

Pistî biryara MGK'ê ya 28'ê rese-miyê, giştînameya hêvotina 8 salane û giştînameya cil û bergen pirşîrêka hêvotinê di rojêvî de tim di rojêvî de hişt, lê mafên zarokên kurdan ên li hemberî hêvotina ku nasnameya kurdan red dike û mafê hêvotina bi zimanê zîkmâkî bala kesî nekişîne. Di rapora ku ji aliye Eğitim-Sena Amed, Mîrdîn û Mazrayê (Elazığ) ve hate amadekirin de hate diyarkirin ku ji ber sedema operasyona bînasname-hîşînê, sazgehîn hêvotinê ketine xizmeti ser.

12 adar 1998 pêncem:

ADALETA BI ŞEWAZA TIRKAN

Ligel gotinê Serokwezîr Mesut Yılmaz ên wekî "Wê 98 bi saleke bêîşkence û bihiqûq" sîstema darîzandinê bi qerara ku duh da, wekî lekeyeke qirêjî a din kete ser dîroka demokrasiyê. Li şuna işkenkaran, kesen ku işkence dîtine, hatin sizakirin.

10 polisên ku işkence li 16 xwendekarên ku piraniya wan di bin 18 salan re ye kiribûn, li Dodgeha Manîsayê ya Cezeya Giran a Dehan, ji ber nebûna delîlan beraat kîrin.

Beratkirina van polisan ji aliye xwendekarê Zanîngeha Celal Bayar a Manîsayê ve hate protestokirin. Parêzîre xwendekaran û mebûsê CHP'ê yê İzmîrê Sabri Ergül, diyar kir ku wîjdanê mirovan nikarê vê bîryare bipejirîne.